

ROJAVA

ÇANDI GISTÎ HJMAR (0) 2018

Semptomên kesayeta feudal.
Rênas Jiyân

Xirabreşkê.
Werger, Zagrosê Haco

Dariştina Serveyî.
Ibrahîm Xelî

Diyardeya nivisandina bi Erebi.
Şepal Hêvo

Lî bin siwaneya pirsên beravêtî.
Ehmedê Huseynî





KOVARA ROJAVA

Ji WEŞANÊN HEVGIRTINA REWŞENBÎRÊN
ROJAVAYÊ KURDISTANÊ(HRRK)
KOVARA ROJAVA. HEJMAR(0) SALA 2018Ê.
Qamişlo. Taxa Siyahî, Avahiya Ehnefê Gemo,
pêşberî dibistana Mihemed Selîm Xelef.
Telefon:(052) 425 134.
Dest:+(963)988155174.
Malper: www.rojava.net.
E.Peyam: rojjava@rojjava.net

NAVEROK

2	Pêşgotin	KOVARA ROJAVA
3	Semptomên kesayeta feudal...	Rênas Jiyan
9	Xirabreşkê	Wergêr: Zagrosê Haco
15	Çand û pirsên bîr û nasnameyê	Hendrên
18	Dariştina Serveyî	Ibrahîm Xelîl
25	D îyardeya nivîsandina bi Erebi ...	Şepal Hêvo
27	Li bin síwaneya pirsên beravêtî	Ehmedê Huseynî
31	Laşê Xweşik	Helîm Yûsiv
35	Pîyalek çaya xweş. George Orwell	Wergêr: Azad Ekkaş
39	Kaufland	Ehmedê Xursî
41	Eyşe Şan	Kakşar Oremar
45	Eugene Ionesco. Hevpeyvîn	Wergêr E.Huseynî
52	Palto. Gogol	Wergêr Narîna Hajo
59	Masiyê Reş ê Piçûk. SAMED BEHRENGÎ	wergêr: Xalidê Ezîz
70	Efrîn	Ciwan Qado
72	Barîn	Ehmedê Xursî
73	Efrîn	Şêro Dalînî
74	Çavên Xeyidî	Ardilan Abdo
76	Çalakiyên HRRK`ê. 2017-2018	Kovara Rojava
79	Şêr û Keroşk	Ji zargotina Kurdî

KOVARA ROJAVA, kovareke çandî giştî ye, her sê mehan dê carekê derkeve. Ji bilî nivîsên bi navê kovarê, her nivîskarek berpirsê naveroka nivîsa xwe ye. Rojava, ji bo hemû nivîskar û hemû rewşenbîran vekirî ye. Ji hejmara yekê û pê ve, dê Rojava desteya xwe ya birêvebir ragihîne. Hejmara (0) ya Rojavayê li Çapxaneya Sîmavê çap dibe. Wêneyê berga pêşîn: Zuhêr Hesîb.

PÊŞGOTIN

Em li xwe digerin, li pênaseyên xwe yên rasteqîne, li helwestên xwe yên rehdaçikyayî û kêlikên revyayî yên dîrok, jîyan, têkçûn û serkeftinên xwe digerin.

Em li xwe digerin da ku em ji xelkê pêtir xwe nas bikin, da ku ji xelkê pêtir li xwe mikur werin û ji xelkê pêtir, ji hev re; bibêjin: gelo ka çî bi serê me, çanda me, zimanê me, xewna me û çî bi serê xeyal û nîgaşa me hatiye?

Dema di lixwegerînê de em pêrgî hestên xwe bibin, pêrgî raman û hizirînên xwe bibin, pêrgî bîr û boçûn û derbirînên xwe bibin, wê demê, em ê dîsa bizanibin ka wê xelkê çî bi serê me û zimanê me û çî bi serê hest û nestên me anîne?

Kovara Rojava jî, li bin sîwaneya bizava lêgerîna li xwe, li kêşeyên nasnameya xwe, li barûdoxên netewe û siberoja xewna xwe, dê hewl bide li koşeyên tarî bigere da ku ron bike. Dê hewl bide beşdarî dewlemendkirina paşxaneya rewşenbîriya Kurdan bibe da ku rewşenbîrê Kurd rola xwe ya civakî û wijdanî kûrtir bike û berpirsiya xwe ya li hember çand û ziman û afirandinê berfirehtir bike û hewl bide ku bersva çend pirsên bêbersiv ên girêdayî heyîn û neyîna me, bide.

Em bi vê hejmarê (0) beşdarî qada kovatgeriya Rojava dibin, bi mebesta ku em jî bikaribin rengê xwe, çêja xwe, dengê xwe û êş û birînên xwe ragihîn û li qelem bidin, bi mebesta ku em jî çend gotinên cihêwaz ji xwe re û ji derdora xwe re bibêjin:

Zimanê me xaniyê bûneweriya me ye, çendîn em bikaribin zimanê xwe spehî, tekûz, şehik, nazik, resen, petî û jixwebawer binivîsin; ewqasî em ê hêjayî nasnameya nivîskarî û rewşenbîriyê bin.

Rojava



Ev kesatî anku kesatîya feodal û bindest, nasnameya wî zêde nayê zanîn; tam tu dibêjî dewlemend e, feqîr derdikeve; yan jî dijberî wê, tu dibêjî feqîr e, dewlemend derdikeve; tam tu dibêjî Kurd e- Tirk derdikeve; tam tu dibêjî jin e, mêr derdikeve; tam tu dibêjî wêrek e, newêrek derdikeve; tam tu dibêjî zane ye, nezan derdikeve; tam tu dibêjî heval e, dijmin derdikeve...

*

Ev kesatî pir durû ye; li cem te be, xwe li te tîne û kîjan tiştê ku tu jê hez dikî, dibêje, lê li paş te, li cem yekî din, tu heqaret namîne ku li te nake; lê li ber xwe nakeve, tam dijberî vê yekê bi koleksiyona xwe ya rûyan pir serbilind e.

*

Kesatîya feodal û bindest ji jidilbûnê dûr e (qet ne jidil e, dûrî jidilbûnê ye), hema bihesibîne ku hemû rewş û mijar jê re ji bo ku kenê wî bînin hene; huner, ol, felsefe, sîyaset, zanyarî, mirin, zayîn, serdestî, bindestî û hemû têgeh û tiştên heyî ji bo wî alavên henekpêkirinê ne; êş, derb, şikestin, têkçûn an jî serkeftinên yekî yan jî miletekî ji bo wî alav û mijarên henekên qehweyan in ku ew bi yekî din re hîrehîrê bike.

*

Ev kesatî pir ji qerebalixan hez dike, tenêtî ji bo wî mirin e, ji ser erdê yan ji bin erdê derxe, civatekê ji xwe re ava dike; gava ku tenê dimîne ditirse ku pêrgî rewşa xwe ya heqîqî were û bi xwe re rû bi rû bibe.

*

Kesatîya feodal û bindest heta tu bibêjî nemerd û çikûs e; dinya giş jî qir bibe, ew di wereqeyeke xwe de nabihure;, koka mirovahîyê giş biqele jî, ew bi qasî qurîncokê jî canê xwe naêşîne.

*

Ev kesatî pir qure û pozbilind e û ji kesên weha bi xwe jî hez nake û heta jê tê ji bo hevaltîyê li nefspiçûkan digere, lê dîsa jî li xwe hay nabe; ji xwe jî bo ku ew li ser serê wan payetîyan bike li nefspiçûkan digere. Ji xwe û alavên xwe pê ve tu kesî û tu tiştî nas nake ku xwe û alavên xwe bide ber wan ku xuya bibe bê kî ye û xwedî çî ye. Bi payetîyê anku xwemezinkirinê piçûktîya xwe dinixumîne. A rast ji xwe tu bejn û mezinatî pê re tuneke ku bitewe jî. Heger wî zanîbûya bê mirin çiqasî xurt û ew zeîf e û bê gerdûn çiqasî mezin û ew piçûk e, her weha ku bê Xwedê çiqasî bêdawî û ew bidawî ye, an heke ew xwedî hişmendîyeke mezin bûya, ji xwe wî yê pozbilindî û payetî nekira.

*

Kesatîya feodal û bindest xerîbdost e, hurmet û hezkirina wî ne ji bo mirovên li dora wî û miletê wî ye, ji bo mirovên xerîb û bîyanî ye, ên wî li ber çavên wî hatine reşkirin, ên xerîb û ne ji wî her tim ji yên wî xweştir û bedewtir in. Kesên xerîb serdestên wî bi bîr dixin, ew wek nêzîkî serdestê xwe bibe nêzîkî her xerîbî dibe, ji ber vê yekê ew ji xerîban hez dike; xerîbdostîya wî lavelav û hêvî ye ku ew xerîb wî ji wê rewşê rizgar bike, hezkirina wî ya ji bo xerîban ne ji kûrahîya dilê wî ye.

*

Ev kesatî newêrek e; ji ramanê ditirse, ji azadîyê, ji mirinê, jîyanê, ji serdestên xwe, ji dewletê, ji Xwedê, ji bavê xwe ditirse û ji tenêtîyê ditirse. Ma çawa netirse! Ew tim di nav kerîyan de jîyaye û tu carî li tu têgehane konsantre nebûye; tu carî jîyaneke aydî wî çênebûye, ne jîyaye; ew her tim ruhê xwe ji bo pêşerojê vedişêre.

*

Kesatîya feodal û bindest xayin e; serdestan ew fêrî xayintîyê kiriye û gava ku wî bi wan re hevkarî kiriye, serdestan ew xelat kiriye. Li gorî wî madem azadî ne mimkun e, wê çaxê tu sedem tune ye ku xayintîyê neke.

*

Ev kesatî pir hesûd e, tu carî tiştêkî wî çênebûye, hemû tiştên wî, biryar û vîndariya wî jî di nav de giş aydî eşîret û serdestên wî ne; ew bi xwe jî ne aydî xwe, aydî hinekî din e; ji ber vê yekê, gava ku çav li bextewarî û serkeftina mirovekî wek xwe û ji xwe dikeve, pir diheside û yekser dixwaze wê bextewarî û serkeftinê reş û tune bike; madem ê wî tune ye û wê tu carî çênebe jî, wê çaxê bila yê tu kesî tune be.

*

Kesatîya feodal û bindest şelaf e; serdestên wî jê mezintir in, ji wî çêtir, baştir, bedewtir, hunermendtir û xurttir in, ew yekî newêrek e û wî bi çavên xwe dîtiye ku serdest çî tînin serê bindestan, bê çawa wan tune dikin û dikujin; ji ber vê yekê, a baş ew e ku ji serdestê xwe re xweş bike û şelafîyê bike û wan û her tiştê wan dahîne ser serê xwe. Ma ne çêtir û bifêdetir e gava ku ew çav li serdestan bikeve û wan mezin bike û gava ku çav li bindestan bikeve wan piçûk bike û piçûk bixe. Ma her tim ne wisa bû ku hinekan di wê civakê de her tim ew piçûk dikir û piçûk dixist, îcar çima ew hinekan piçûk neke û piçûk nexe!

*

Ev kesatî bê bîr e; koka wî hatiye qurmiçandin, dîroka wî hatiye tarîkirin,

hemû alavên ku pê bîra wî çêbibe û kûr bibe ji destên wî hatine stendin. Ma bîr ne hebûn e? Ma ji bo tunekirinê divê mirov berî her tiştî ji tunekirina bîrê dest pê neke? Ma ne ya ku bindestan bindest û serdestan serdest dike bîra ku şîûrekê çêdike?

*

Kesatîya feodal û bindest nezan e, ma ji quretî û payetîya wî ya ku ew wek bi her tiştî dizane û tev digere xuya nabe bê ew çiqasî yekî nezan e? Ma ji bilî fesadî, tinazî û tiralîya hişî, wî xwe bi çi êşandiyê ku nezaniya xwe ji ser xwe rake? Ma serdest ewqas bêhiş in ku zemîn û derfetên zanîne jê re ava bikin û rê li ber azadîya wî vekin?

*

Ev kesatî dijûnkere, bi awayekî jidil û zanistî zû bi zû nikare li ser mijarekê bi axive, ji ber ku mirovekî hîsî û bêkontrol e, di ser û binê gotina wî de çêrek anku sixêfek heye. Ji ber ku ew nikare xwe bi axaftinê îfade bike, mecbûr dimîne ku xwe bi dijûnan vala bike.

*

Kesatîya feodal û bindest bêhedan e, tu carekê bala xwe didê wa ye bi hewa ketiye difire û careke din wa ye ketiye erdê û ser û guh di nav herî û tozê de bi erdê re dixişike û tu bala xwe didê, rojekê bûye yekî pir baş û roja din tu bala xwe didê, jê xerabtir kes tune.

*

Kesatîya feodal û bindest fesad e; ji ber ku nezan e û tu serhevdeyêke wî ya zanîne tune; gava ku ew li cem yekî din be jê re qala çîrok û serpehatiyên yekî ku ew wî dinase dike. Ew sirf bi awayekî neyînî qala yê din dike ji bo ku ew wek leheng xuya bibe. Ger ew qala fesadîya yekî din neke û qala xwe bike hemû gotin û çîrokên wî li ser mîrxasî û lehengîya wî ne; ji bilî fesadîya yekî û çîrokên xwe yê lehengîyê nikare qala tişteki din bike; ger derd an jî pirsgerêkeke wî hebe rasterast qal nake, ji mirovê hemberî xwe dixwaze ku ew wî hîs bike, ji diyalog û axiftinê bêtir bi hîsên xwe tev digere.

*

Ne hunerhez e, ji ber ku ruhê wî zêf û nizm e û ji ber ku huner xîtabî ruh û kêrahîyê dike; gava ku pêrgî xebateke hunerî dibe, revî revî jê direve.

*

Çikûs e, qurîşekî bi îmana xwe nade; ji ber ku ji mirinê bawer nake û ji ber ku bêbîr e bêyî ku bizane bê ji bo çi dide ser hev, hey kom dike, carinan ji bo ku ji yekî din pênc qurîşan bi dest bixe, biqasî qurîşekî comerdîyê dike.

*

Bê bawerî ye, ji tiştêkî bawer nake; carinan ji bo ku mirovên dora xwe bixapîne, wek ku bawer dike tev digere, lê di esasê xwe de ji tiştêkî bawer nake; a rast newêre bawer bike, ne ji azadîyê, ne ji Xwedê, ne ji mirinê, ne ji serkeftinê, ne ji hevaltîyê, ne ji evîndarîyê, ne ji welatparêzîyê, ne ji hunerê, ne ji xwe û ne jî ji tu kesên dora xwe bawer dike. Mirovê ku kûrahî, fedakarî û wêrekîya wî tunebe, nikare bawer bike.

*

Xeydok e, ji gotin, tevger, bişîrîn, rexne, kuxik, nêrîn û gelek tiştên din dikare xwe bixeyidîne. Bêyî ku sedema xeyda xwe bibêje, xwe dixeyidîne. Her tişt jê re "bi-wate" ye li gel ku jîyana wî pir "bê-wate" ye jî.

*

Tiral e; ma ne ji xwe ji ber wê tiralîya wî ya hişî û bedenî bû ku ew bindest mabû; ji xwe heke xebatkar be jî, ev ne ji bo wî, ji bo serdestên wî ye. Herî pir jî tiralê ramanê ye, fikirîn ji bo wî bi qasî mirinê tiştêkî dijwar e.

*

Desthilat e, ji ber ku serdestên wî her tim li ser serê wî desthilatî pêk anîye ew jî di hemû têkilîyên xwe de desthilat tev digere. Totalîter e, bi emir û ferman tev digere û tev digerîne.

*

Saf e, kî çî jê re bibêje, tavilê dikeve serê wî, ji ber ku hişê xwe kêmbixebitandîye. Sentez, analîz, muhakeme û muqayese, lêpîrsîn û lêkolîn tê de zêf e; ev jî dibe sedem ku zû qani' bibe, an jî zû bixape.

*

Hêrsok e, wek ewr û tavên biharê digirniye û pir zû hêrs dibe, ne ew hêrsa xwe, hêrsa wî wî kontrol dike, piştî hêrsê her tim poşman dibe.

*

Koledar e, ji kê xurttir be, wan dike koleyên xwe; gava çav li yekî ji xwe xurttir dikeve îcar ew ji wî re koletîyê dike. Hîsa neteweperwerî, welatparêzî û hawîrdorparêzîyê tê de kêmbixebitandî ye, ji ber ku welat û dinyayê yên xwe nahesibîne û ji ber ku yekî bexîl e, tu sebeba ku ew ji wan hez bike nîne.

Dilbijok e, dilê xwe dibijîne ziman, raman, tevger, xwarin, lixwekirin, ken, nexweşî, kuxik, qirpik û bawîşkên ê ji xwe xurttir, anku serdestê xwe.

*

Bê zeman e, têhega demê jê re nîne, ew ne di berî mîladê de ne jî di piştî mîladê de, ew ne di dema modern de, ne jî di ya klasîk de dijî. Di nav alavan de alava ku ew herî pir jê nefret dike û wê wek tiştê belasebeb dihesibîne saet e. Her weha salname û dîrok jî zêde bala wî nakişînin. Zû yan jî dereng, îro yan jî do jê re ne girîng e. Hemû dem dema borî, dema nuha û dema bê..., giş jê re wekhev û bêwate ne.

Xirabreşkê

Çavkanî: Wikipediaya Swêdî
Werger: Zagrosê Haco



Ev nexşeya Başûr-Rojhilatê Tirkî ye, cihê ku Xirabreşkê lê dikeve.

Xirabreşkê (Göbekli Tepe) cihekî kevn ê olperestîyê ye, ku dikeve di Tirkîyeya îroyîn de. Tê bawerkirin ku ew yek ji kevntirîn avahîyên olî yên ku li cîhanê hatine dîtin, kevnahîya wê jî vedigere dora 12000 salan û ev pûtxane bi xwe jî vedigere heyamê neolîtîk.

Li ser zincîra çîyayekî ku 760 m bilind e hatiye avakirin. Ew li Başûr-Rojhilatê Anatolyayê dikeve, ku nêzîkî Bakur-Rojhilatê bajarê Rihayê (Ûrfa) ye. Ew bi destê gelê herêmê bi kevirên mezin ên şekirî, berî 12000 salan hatiye avakirin. Di wî heyamî de hê jî nizanîbûn metal û seramîkê bi kar bînin. Xirabreşkê 15 m bilind e û 300 m fereh e.

Arkeologên Alman di sala 1994 de bi serperîştîya Klaus Schmidt ji Înstîtûya Arkeolojî ya Almanî ya li Sitenbolê dest bi vekolînê kir. Şopa tu lawirên kedî yan şînî û darên çandî nehat dîtin. Xuya ye ku xwarina wan hemû ji şînî û lawirên kovî bû. Lê cûreyekî genim ê taybet li wir hatiye dîtin. Ev yek jî dide xuyakirin ku wan çandinî nedikir.



Cihê kolandinê yê li Xirabreşkê

Li Xirabreşkê çend avahî hene; kêsîmê wan bi ser tîpa 'T' ve diçin. Ji kevirên monolît hatine avakirin. Li ser wan keviran şêr, ga, balinde, mar, quling, legleg, qû û dûpişk hatine çêkirin.

Ev şûnewar cara pêşî di 1964an de ji aliyê lêkolînerên arkeolojî yên li Zanîngeha Sitenbolê û li Universîteya Chicago ve tê vedîtin. Dema ku çavên wan bi girê Xirabreşkê ket, wan nas kir ku ev ne girekî xwezayî ye. Ji ber ku li wir gelek kevir û qehfik hebûn, loma wan guman dikir ku ew goristaneke Bîzansîyan e. Bi salan gundîyên herêmê çandinî li vî cihî dikirin û kevir ji nav erdên xwe derdixistin.

Schmidt ji Deutsches Archäologisches Institut karê xwe li herêmê li cihekî nêzîk dikir, di ber re bi tîma xwe re ji xwe re vekolîn li Xirabreşkê jî dikirin. Wî hin belgeyên lêkolînerên ji Chicago li ser vê herêmê dîtin, wan bi kurtî behsa Xirabreşkê dikir, êdî wî biryar da ku Xirabreşkê hêjayî guhdaneke bêhtir e. Wî zû nas kir ku ev gir pir kevnar e. Di wê salê de, sala 1995an, bi hevkarîya Mûzexaneyê Rihayê wî dest bi kolandinê kir û sitûnên teşe-T dîtin. Xuya bû ku cotkaran hewl daye wan sitûnan ji bo karên xwe bişikînin, dibe ku wan nizanîbû ew kevirên mezin ji çi re ne.

Dîtina Schmidt a li ser Xirabreşkê ji aliyê piranîya pisporan ve tê pejirandin, dibînin ku ew pûtxaneyê çiyayî ya pir kevnar e. Wî temenê wê bi metoda pîvana radyokarbonî (radiocarbon dating) çespand. Û analîzên kûr didin nîşankirin ku Xirabreşkê pûtxaneya herî kevnar e ji nav hemû

pûtxaneyên ku li ser rûyê erdê hatine dîtin. Schmidt navê Katedrala li serê gir li pûtxaneyê kir û got ew wek hecê bû, xelk ji dûrahîya 160 km dihatin serdana wê. Hestîyên gelek lawiran li derdora pûtxaneyê hatine dîtin. Xelkên ku dihatin serdana vî cihê pîroz lawir bi xwe re dianîn û li wir digurandin ku bibin qurbanî û belav dikirin. Hestîyên xezal, beraz û qazan di nav hestîyan de hatine naskirin.



Li herêma kolandinê ya taqên A ta D, ji sala 2011



Vedîtînen ji Xirabreşkê li Muzexaneyaya Rihayê

Di vê demê de heyamê çandinîyê dest pê dike

Dîmena herêmê bi derbasbûna salên dirêj re di bin bandora seqayê û erdhejan de, her weha bi destê mirovan hatiye guhertin. Sitûnên kevirîn ên xwezayî di çiyê de li wê herêmê hene, peykerên pûtxaneyê ji wan hatine çêkirin û şekirin.

Xelkê herêmê xwe bi nêçîrvanî û komkirina xwarinê xwedî dikir, mirov beşek ji jîyana xwezayî bû. Destpêkirina heyamê çandinîyê di dîroka mirovatîyê de guhertineke mezin bû. Arkeologê Australî V. Gordon Childe navê "Şoreşa Neolîtîk" lê dike. Di destpêkê de, dihat texmînkirin, ku guherîn zû pêk hat, lê di dawîyê de hat xuyakirin ku ew şoreş ne ji nişka ve bû, lê belê ew gav bi gav ji heyamê nêçîrvanîyê derbasî heyamê çandinîyê dibû. Ew ne şoreş bû, ew pêvajoyeke dûr û dirêj bû.

Dîtaneya (theory) çilo û çima ev guhertin pêk hat, dibêje ku ew ji ber du sedemên sereke bû, yek jê, sedemên derve, dudu jî yên ji hundir ve bûn, wek: "Guhertina seqayê û pêdivî bi xwarina bêhtir."

Trevor Watkins ji Zanîngeha Edinburg dide xuyakirin ku çandina genim li dora berî 8800 salan berfireh bû û pê re kedîkirin û xwedîkirina lawiran jî berfireh bû.



Sitûna 27 ji taqa C, peykerê lawirekî li ser hatiye çêkirin.



Nexşeya Kevanê bi xêr û bêr di dema xwe ya herî kevn de ku digihêje 10000 salî BZ (Berî Zayîne). Li vir cihên herî girîng tên dîtin.

Arkeolojê sereke Klaus Schmidt guman dike ku pêşveçûna Xirabreşkê bandora xwe li gundên derdora xwe jî kiriye.

Arkeolog Brian Hayden dîyardeya li Xirabreşkê şîrove dike, dibêje: Pêşveçûna hêzên civakî berî heyamê çandinîyê dest pê kiriye û mîlmilaneya civakî di navbera komên nêçîrvanan de bilind bûye. Xelkê, bêhtir giranî daye ser dahatinê. Dibe ku vê yekê binyata civakî guhertibe û piştêr bûbe sedem bo lezkirina pêşveçûna ber bi çandinîyê ve.

Hin dîrok nas sedemê vedigerînin pêşveçûna derûnî ya xwezayî û dibêjin ku ew li pişt şoreşa çandinîyê bû.

Xirabreşk, xwedî girîngîyeke taybet e û 12000 salî ye. Çand û avahîyên wê, şaristanî û rê û rismên wê yên bi heybet bi çavekî bilind tînin nîrxandin. Li wir tu şop ji kedîkirina riwek rehek û lawiran nayê dîtin, lê belê, wek Qerejdaxê, zû genim lê hatiye çandin.

Çavkanîyên çapkirî:

- Charles C. Mann; "The Birth of Religion: The World's First Temple" National Geographic Vol. 219 No. 6 (juni 2011), sid.34–59: <http://ngm.nationalgeographic.com/2011/06/gobekli-tepe/mann-text>
- Steven Mithen; *After the Ice: A global human history, 20,000-5000 BC*. Harvard University Press, Cambridge MA (2004). ISBN 0-674-01570-3. Sid. 65–69, 89–90.
- J. Peters & K. Schmidt; "Animals in the symbolic world of Pre-Pottery Neolithic Göbekli Tepe, south-eastern Turkey: a preliminary assessment." *Anthropozoologica* 39.1 (2004), 179–218: http://www.mnhn.fr/museum/front/medias/publication/10613_Peters.pdf.
- Scarre, Chris (red); *The Human Past*, Hudson&Thames, London (2005).
- Klaus Schmidt; *Göbekli Tepe. Eine Beschreibung der wichtigsten Befunde erstellt nach den Arbeiten der Grabungsteams der Jahre 1995–2007. I: Erste Tempel – Frühe Siedlungen. 12000 Jahre Kunst und Kultur. Ausgrabungen und Forschungen zwischen Donau und Euphrat*, für ArchaeNova e. V. Heidelberg hrsg. von Klaus Schmidt. Isensee, Oldenburg (2009), sid. 187–223. ISBN 978-3-89995-563-7.
- Klaus Schmidt; *Göbekli Tepe – the Stone Age sanctuaries. New results of ongoing excavations with a special focus on sculptures and high reliefs. I: Documenta Praehistorica 37* (2010) sid. 239–256.
- Oliver Dietrich, Manfred Heun, Jens Notroff, Klaus Schmidt, Martin Zarnkow; *The role of cult and feasting in the emergence of Neolithic communities. New evidence from Göbekli Tepe, south-eastern Turkey. I: Antiquity 86* (2012) sid. 674-695 [PDF](#).



ÇAND Û PIRSÊN BÎR Û ASNAMEYÊ

HENDRÊN

(Pêwistîya me bi rêbazekê heye; rêbazeke ku bikaribe astengên me ji me re eşkere û ronî bike, cihêwazîyên me biafirîne û demê jî berhemdar bike.)

Têgihastina nivîsandinê wek çemk û têgeh(concept), têgihastina afirandina pirsan e û di astên avakirin û dagirtina valahîyên bîr û yadwerî û dîrokê de; têgihastina bikaranînê ye.

Ev têgihastin û ev bikaranîn jî şêweyek ji şêweyên geşbûn û pêşveçûna hebûna kultûrî û xwenasînê ne û beşdarbûna seqa û cihanên pirsên hemdem in; pirsên ku li çarenûsa mirovatîyê digerin.

Dema ku em hewl bidin ku vê têgihastinê, wek erkekî serekî di jîyana xwe û di hemî warên cihêreng ên civaka xwe de bi kar binin, bê guman, bi wê hewldanê em ê hişmendî, hişyarî û agahîyeke mêjûyî biafirînin.

Prensîpa bingeşîn a vê hişyarîya mêjûyî: Bîr û bîrewerî, nasname û kultûr e û di meydana çanda navneteweyî de xweçesipandin e.

Arezû û xwestekên ku agahdarîyê (consciousness) û vê avahîya hişmendîyane ya agahdar dadimezirînin peywendî ne; peywendîyên laşê cih û demê ne: Reng, bîn, hiş û bîra bizavker û zindî ya ku em pê hatine bişaftin û buhujîn.

Prensîp wisa dibin simbol û di dawîyê de di têgihastina agahîya me de bi cih dibin.

Nîşan jî (cih, dem, reng, bîn, hiş û bîra zindî) wek xeyaleke taybetmend me dehf didin ku careke din em li wan bigerin da ku nemir bibin. Ji xwe ev

hest bi xwe -wek dudilî û saw û velerzîn- me amade dike da ku em bibin xwedanên bûnewerîyeke çandeyî.

Sitûna bingehîn a vê bûnewerîyê li gorî Haydger ziman e (ziman dilê bûnewerîyê ye.)

Li vir, pirs a çandî hewldana di gel dîrokê ye; anku dilê bûnewerîyê ye, damezirandin û çêkirina peywendîyê ye; ne ku jêdûrketin û dabirîn e, ji ber ku dûrî dîrokê dikevin û dabirîna peywendîyan derçûna ji bûnewerîyê ye; bi kurtî xwekuştin e.

Serencama vê prosesê jî -dûrketina ji dîrokê û jê cihêbûn- windabûna bîranîne ye anku nema bibîrhatin e, bi bêrûmetî li xwe temaşekirin e û xwe riswakirin e.

Bi vî awayî hişmendî winda dibe, windabûna hişmendîyê jî windabûna bîra dîroka mirovatîya me ye.

Hestkirina bi hebûna vê hişmendîyê yanî hebûna projeyeke ramanî ye; raman bi xwe jî verijandina tiştan e.

Erkê nivîskar jî bêrîkirin e; bêrîkirina xwenêzîkahîya ber bi dîroka bîrê ve ye û parastin û perestîya wan nîşanan e; nîşanên ku hem di kûrahiya laşê wî de dihêwirin û hem jî laşê wî pêk tînin.

Hewldana me axaftina bi afirandina vê bûnewerîyê re ye, ji nû ve vejandina wê ye, bi şeweyekî din, da ku bi serbilindahî henasê (nefesê) bikêşe.

Lê dîyar e ku koçberîya xewnên me; xewna bi civatê, bi cemawer, bi kurdewarî û bi gelê Kurd, li ser durêyan û rêçên partîyên me, rêçên xwe winda kirine.

Ev windabûn wisa li me dike ku em dîroka hiş û bîra xwe serjêkirî dibînin.

Reng e ku hişmendîya me bi xwe hişê xwe winda kiribe yan jî bi dawî hatibe.

Ku xewn nemîne şer dest pê dike.

Şerê îro jî berî her tiştî laşê me dikuje.

Kuştina lêş jî kuştina xewnê ye.

Beşdarîya nivîsandinê di gurkirina şer û kuştina lêş de, me li hemberî pirseke tirsnaq datîne. Pirs a ku hema hema wextî têramandina aqilê me rawestîne.

Ne xwe bêrîkirina ku em li ser peyivîn, me ji bîr kiriye(!).

Di hundirê gergerînek û labîrênta şer û pevçûnê de em dergehên rizgarîyê winda dikin.

Lewra projeya jixwedexisîn û riqlixwebûnê dest pê kiriye.

Di vê bareyê de û di vê rewşê de jî, em erdnîgarîya wan nîşanên ku hebûna me ne, ber bi nava erdnîgarên rengên şerên partîyên hişkuj û xewnkuj ve vediguhêzin.

Di vê pêvajoya kujdar de, nivîskar xewnan di kuje û di heman demê de nivîsandinê jî di kuje.

Bêdesthilatkirina nivîsandinê bêdesthilatkirina nivîskar bi xwe ye jî ji ber ku di vê rewşa malkambax de, nivîsandin ne dibe û ne jî dikare bibe alava berhemdayîna hişmendîya berhemdar, anku aqilê ku ramanê diafirîne.

Ev dîyarde, li hemberî partîyên me yên xewnkuj û di çarçoveya alîgirî û dabeşbûna li ser sînorên vê hêzê û wê hêzê, dîyardeya nivîskarê Kurd e.

Pirsa ku bîr û hiş û bûnewerîya vî hişî bixwe, pirs nîşan û hêma û nasnameyê, pirs bîn û reng û kesatîyê, di berhemdayînê de, ji bîrbûyî ne. Jibîrkirî ne.



Darîştina Serveyî

Ibrahîm Xelîl

Darîştina gotinan yek ji teknîkên zimên ên herî sereke ye. Her dem tiştine nû derbasî jîyana mirovan dibin û ev teknîk bi alavkirina hin gotinên resen û kevn gotinine nû tîne holê da ku nav û nîşandanên wan tiştên nû pêk bîne.

Di Kurdî de, hin gotin ne bi hûrbînî hatine darîştin, û metirsîya vê hûrnebînîyê ew e ku sibe dê gotinine nûtir derkevin ku bi van gotinên ku mirov îro darîştîye bêhtir diguncin wek gotina (devkî) ku me îro darîştîye hember gotina (شفهي) dê çawa be ku sibe gotina (فموي) bi Kurdî ji pizîşkên Kurd re gerek bibe?!

Di vê babeta hûrnerînxwazîyê bi xwe de, nimûneyeke M. Mesûd Mihemed* pir xweşik û balkêş heye, ew dibêje ku gotina (çargoşe) ya nûdarîştî hember gotina (مربع) pirsgirêkekê çêdike der barê darîştina gotinine din de bo (مستطيل، معين، شبه) (منحرف) ku hemû jî çargoşe ne.

Di vê nivîsara piçûk de, me bîst gotinên nûdarîştî ji alavên ragihandina Kurdî dane hev û va em wan li ber çavê lêkolînê radixin û nêrîna xwe ji cenabê xwîneran re tê de dîyar dikin:

1- Serkeftin

Bi wateya (Victory = النصر), lê dema ku Kurd dibêjin ku filan tişt bi ser ket, mebesta wan jê (طفا) ye wek çawa ku text bi ser avê dikeve, û qeymax bi ser şîr û mast dikeve.

Ku du mirov pev diçin, Kurd dibêjin ku filankeso (Zor)a bêvankeso (bir) anku jêder (zor birin) e, û der barê kesê din de dibêjin (Zor)a bêvankeso (çû) an ku jêder (zor çûn) an (zor çûyîn) e, êdî ya rast ev e:

(Victory = النصر) = Zorberî

(Victorious = المنتصر) = Zorber

(Defeat = الهزيمة) = Zorçûyîn

(Defeated = المنهزم) = Zorçûyî

2- Çand

Bi wateya (Culture = الثقافة) ya Ingilîzî û Fransî. Xuya ye yê ku ev gotin dariştiye li Ingilîzî û Fransî nêrîye û dîtiye ku du wateyên (culture) di wan zimanan de heye (ثقافة+زراعة), û ji xwe re gotiye ka em (çand)a Kurdî jî bikin bi heman her du wateyan û weha (ثقافة) bû (çand). Lê ya rast ew e ku ev gotin (culture) di etîmolojîya xwe de li van morfêmên newekhev dabeş dibe:

- (Culture = زراعة): ji (cul = qûn) + (ture = terre = xak).

- (Culture = ثقافة): ji (cult = peristî) + (ure = parkîteke bo dariştina navdêran)

Di nêrîna min de, ji ber ku (ثقافة) ji çandinîyê nêzîktirî peristîyê ye, gerek ê darêjer ev gotin wisa dariştiba (cult = peristî) êdî (culture = peristarî).

Lê ji alîyekî din ve, ez dibînim ku dariştina (rewşenbîrî) yan (ronakbîrî) ku li Başûrê Kurdistanê bi kar tê ji (çand) û hem ji (peristarî) jî dirusttir e:

- Rewşenbîr = المتقف

- Rewşenbîrî = الثقافي

- Rewşenbîrane = بشكل ثقافي

- Rewşenbîrtî = الثقافة

- Rewşenbîrkin = التنقيف

- Hewrewşenbîrtî = التثاقف

3- Wek

Bi wateya (as = ك) ya Ingilîzî û Erebî.

Di gotara me ya sîyasî ya îroroj de, ev gotin pir bi kar tê:

"Ez wek Kurdekî serbixwe nêrîna xwe dibêjim / em wek millet xwedîmaf in / ew wek berpirsyar diaxive ...hwd".

Bikaranîna vê gotinê bi rêya wergerandin û têkilîyên bi zimanên bîyanî re (nemaze Ingilîzî û Erebî) derbasî Kurdî bûye, lê di Ingilîzî û Erebî de du peyv hene (like = مثل / as = ك), û yê ku ev bikaranîn derbasî Kurdî kiriye ji gotina (wek) pê ve li pêşîya xwe nedîtiye û heger hîn bêhtir xwe li kûrahîya zimanê Kurdî berdaba û xwe biwestanda, ê li gotinine rasttir rast bihata:

Kurdan di wateya (wek) de gotiye (mîna -nola ...) û her weha parkît bi kar anîye û gotiye (asa - sa - san - weş ...) ku yek ji wan bi kêmanî cîyê (as = ك) dadigire.

4- Birêveber (tew bi bikaranîneke şaştir "Birêvebir"):

Bi wateya (director = المدير), ji vê zincîreya morfemî ya dirêj (daçek + navdêr + paşdaçek + parkît) hatiye dariştin, lê ya çêtir û guncawtir ew e ku navdêrê dariştî ji kêmtirîn hêman pêk bê, û ez dibînim ku gotina (karger) ya ku ji (navdêr + parkîta ger ku ji gerandinê hatiye) pêk tê kurttir û siviktir e.

5- Dadgeh

Ev gotin ji du morfêman hatiye dariştin (dad = العدالة) + (geh = مكان). Lê ez dibînim ku gerek ew cihê ku du neyar xwe lê bigirin da ku nav wan safî bibe navê (navcîgeh)ê hilîne ji ber ku ew li wî cihê tên navcîkirin, û ew navcîkirin dibe bidadî be û dibe bêdadî be.

6- Wekhevî

Ev gotin li hemberî gotina (المساواة) hatiye dariştin lê bi rastî ew bêhtir wateya (المماثلة والمشابهة) dide, û ya rasttir ew e ku em bibêjin (yeksanî)

7- Dîrok

Bi wateya (history = تاريخ) di Kurdî de bi kar tê.

Reha vê gotinê Farisî ye û bi heman wateyê, lê şaştiya ku me divê em behsê bikin der barê vê gotinê de ku ew bi wateya (date = تاريخ) bi kar tê.

Carcaran, di meha nîsanê de, em ê di jêra vexwendinekê de bixwînin: (Sêminêra me dê li filan derê li dar keve, Dîrok: 3 / 5 / 2018) an ku di rojekê de ku hîn li pêş e...

Dîrok bûyerên demçûyî ne, ne yên hatî ne, lewra bi kêr nayê ku ez ji demeke hîn nehatî re bibêjim "dîrok", lê ya rast û dirust li vir (berwar) e.

8- Nûçegihan :

Anku ew kesê ku nûçeyan ji derekê diguhêze bo dereke din.

Ev parkîta (gihan) di Kurdî de tune ye ji ber ku parkît ji dema nuha - ne ji ya borî - tên dariştin, û lêkera (gihandin)ê di dema nuha de dibe (ez digihînin, tu digihîni, ew digihîne...) anku reh (gihîn) e ne (gihan)e lewra ev gotin gerek (nûçegihîn) be.

Lê ya ji her duyan çêtir û dirusttir wek ku ez dibînim: Gerek em parkîtê ji lêkera (resîn)ê darijînin û gotin bibe (nûçeres), melayê Cizîrê dibêje:

(ger nebit **dadiresek** beyhude feryadê çi kit?) an ku ew kesê ku gilî û gazinan bigihîne.

9- Pênûs

Ew alava ku mirov pê dinivîse.

Ji xwe gotina (qelem) ne gotineke Erebi ye da ku em xwe jê biparêzin, lê gotineke Kurdî kevn û resen heye bi wateya wê, ew jî (kilk) e.

Di Ingilîzî bi xwe de gotineke ji (pen) kevntir heye, ew jî (quill) e ku ew û (kilk) ji rehekê ne.

10- Lênûs

Ew gurzpelên ku mirov li ser dinivîse, lê ev jêderkirin ne di cîyê xwe de ye ji ber ku mirov ne (li) wê gurzpelê dinivîse lê li ser an tê de.

Gotina (defter = دفتر) gotineke erebîkirî ye, û di koka xwe ya etîmolojî de (dep + terr) an ku (depê terr) ku li ser dihat nivîsandin berî ku hişk bibe. Ji heman kokê (adobe) a Ingilîzî û (طوب) a Misrî.

Ereban ev gotin ji mêj ve ji Kurdan bariye, û ji ber ku (P) di zimanê wan de tune ye, wan ew kiriye (F) wek çawa : Pîl kirine (فيل), Pergar kirine (فرجار), Pêrist kirine (فهرست), Polad kirine (فولاد)

11- Texte yan textereş yan tablo (اللوحة المدرسي)

Texte ji text hatiye anku (خشب) û gotina tablo Fransî ye.

Ez dibînim ku gotinên (table - tableau) ji heman koka gotina (dep) a Kurdî ne, û her weha jî dibînim ku gotina (board) a Ingilîzî ji koka gotina Kurdî ya kevn (berd) e ku nuha bûye (ber) anku (kuç an kevir = رُقم).

Ji lew ra em dikarin gotina (dep) an (berd) bibin wek hev wateyeke rastîn û cihgirtî ji gotina (لوحة) re.

12- Berdevk

Ev gotin ji (ber + dev + k) hatiye dariştin da ku wî kesê ku bi zimanê civatekê yan dezgehekê biaxe û bîr û rayên wan ji xelkê re veguhêze nîşan bike.

Ez dibînim ku di Kurdîya dewlemend de, gelek gotin hene cihê vê gotina şaş bigirin wek (zarguhêz) an (bîrguhêz) an (hevdevk) an (hevziman) an jî (gotar) ku ji (guftar = ناطق) a Farisî hatiye û bi şaşî di Kurdî de li şûna (nivîsar = مقالة) bi kart tê...

13- Yekem û yekemîn

Ev gotin ji jimara (yek) hatiye dariştin, û bê guman ew ne şaş e lê carcaran bi şaşî bi kar tê.

Di ragihandina Kurdî de, t'ê bixwînî: "Ev yekem pertûka mamosta filankes e" yan "Mihrecana yekemîn li filanbajarî li dar ket"

Ev jimarên pileyane gerek di cîyên xwe yên dirust de bîn: A ku parkîta wê (em) be gerek piştî navê berjimarê bê, û ya ku parkîta wê (emîn) be gerek li pêşîya navê berjimarê bê, an ku (pertûka yekem) û (yekemîn mihrecan).

Kurd dibêjin (bajarê kevntir, çemê dirêj û çîyayê bilind) lê (kevntirîn bajar, dirêjtirîn çem û bilindtirîn çîya)

14- Peymangeh

Ev gotin bi wateya (institute = معهد) tê bikaranîn, dera ku xwendekar xwendina xwe ya bala lê tekûz dike yan dera ku xwendineke ne-dibistanî jê werdigire.

Bêguman im ku darêjerê vê gotinê ew ji zimanê Erebi bi awayekî rasterast -lê serveyî- anîye. Wî texmîn kiriye ku (معهد) ji (عهد = soz û peyman) hatiye û paşgira (geh) jî cî destnîşan dike êdî xem nedît ku gotina "Institute" bike "Peymangeh".

Lê (المعهد) di ferhengên Erebi de tê bi wateya (dera ku mirov hogirî wê dibe û çî cara ku jê dûr bikeve lê vegere) an ku di Erebi bi xwe de ev gotin ne ji soz û peymanan dariştî ye.

Di nêrîna min de, gotina (amojgeh) an (fêrgeh) bêhtir bi navendeke fêrkirina bala re digunce.

15- Parêzvan

(parêz) û (van) her du jî parkît in, û Kurdan qet gotinek ji du parkîtan danerîştîye lê ji (navdêr + parkît) wek: tembûrvan, daholvan, nêçîrvan..., û her weha (parêz) reha dema nuha ya lêkera (parastin)ê ye û dibe ku em bibêjin (welatparêz) der barê wî kesê ku welatê xwe diparêze de.

A rasttir ew e ku mirov bibêje (xakparêz û gelparêz û mirovparêz ... hwd)

16- Çalakvan

Çalak gotineke Hindî ya bi wateya (kesê jîr û jêhatî) ye û di ziman de rengdêr e ne navdêr e, û nabe ku paşgira (van) bi rengdêran ve be, Kurd dibêjin: Segvan, gavan, bilûrvan, merrvan, lê qet nabêjin (başvan û pîsvan û kinvan û dirêjvan ...)

17- Heyva Sor

Dezgeheke tenparêz e ku li cem Misilmanan li hemberî (xaça sor) hatiye damezirandin.

ê ku ev gotin dariştiye, bê guman, xwe spartîye zimanê Tirkî ku navê (kizil ay = heyva sor) li vê dezgehê dike.

Melayê Cizîrî dibêje (Mitrê mehê new ger te divêtin me bibînî) lewra ez dibînim ku gotina (nûmeh) pir guncaw e bo (الأحمر الهلال)

	Heyv	Nûmeh
Ingilîzî	moon	Crescent
Fransîzî	Lune	Croissant
Erebî	(القمر) (El-qemer)	(الهلال) (El-hilal)

18- Pêşkêşvan

Ev gotin ji (pêş + kêş + van) lêkdayî ye bi wateya wî kesê ku tiştêkî ji dest an ji dev dide kesine din. Şaştiya ku di vê gotinê de bûye ew e ku du parkît pê ve hene (kêş + van). Gerek e gotin tenê (pêşkêş) be wek kirdeyê pêşkêşiyê û mirov ji bo kêşanê wisa bibêje: Ez pêş dikêşim, tu pêş dikêşî, ew pêş dikêşe...hwd

19- Rojname yan rozname (bi wateya تقويم)

Şaş e ji ber ku ev gotin (newspaper = صحيفة) ye û ji bo (تقويم) gerek mirov bibêje (salname).

20- Elektrîk

Rewşenbîrên Kurdan ev gotin ji zimanê Tirkî - yê ku ji Ingilîzî biriye – biriye. Ji alîyekî din ve, rewşenbîrên Kurd li Sûryayê ji bo ku xwe ji gotina (كهرباء) a Erebi dûr bixin vê gotinê bi kar tînin. Lê ku ew bizanin ku (كهرباء) gotineke ji Kurdî Erebi kirî ye wilo nakin. (kehreba) ji du peyvên Kurdî pêk tê (keh + reba = التين جاذب) ku îro (keh) bûye (ka) û (reba) bûye (reva) ji revandinê.

* " Zarawesazîyî Pêwane" / - Govarî Roşinbîrî Nwê / jimare 111 - 112 sal 1986



Şepal Hêvo

D îyardeya nivîsandina bi Erebî di torên medyaya civakî de

Rastîya ku Facebookê bandoreke mezin li hemî civakên cîhanê kiriye; tê wateya ku ew bûye pêdivîyeke girîng di hevparkirina hemî mijaran de. Mînakên vê xalê jî bê dawî ne, lê dixwazim li ber mijara ku nêzîkî %90 ji Kurdên Rojavayê Kurdistanê zimanê Erebî bi kar tînin rawestim. Di Facebookê de delîveya bikaranîna zimanê Kurdî peyda ye anku mirov dikare rûpela xwe ya kesatî bi Kurdî bişopîne; di bikaranîna vê babetê de jî Kurdên Rojavayê Kurdistanê lawaz in.

Çima Ziman? Ziman êzingê pêşketina çandê ye. Dema ku beşekî mezin ji Kurdan zimanên bîyanîyan bi kar tînin, tê wateya ku çanda me êdî têk diçe, ev dîyarde bûye êşeke giştî di nav Kurdan de. Kurdê ku hewl dide ku bi Kurdî binivîsîne nayê wê wateyê ku erkê wî kesî ye bi awayekî pispor ziman bi kar bîne anku gerek e bi şeweyekî durust bi kar bîne û ji ber ku torên medyaya civakî bûne derfeta sereke di vê serdemê de, em ê li ber aloziyên wê rawestin.

Dema ku postekî Kurdî belav dibe di heman kêlîkê de nehsed û not û


neh postên bi zimanê Erebi jî belav dibin, ji xwe dema ku şerek anku berxwedanek hebe, ji hedê bavê Kurdekî ye ku mijara ziman bi lêv bike, anku yê di ber ax û doza xwe de jîyana xwe ji dest didin hêja ye ku mirov bi Erebi wan lehengan bi bîr bîne. Tenê hevoka "her bijî yan Kurd û Kurdistan" rewa ye. Ev navê wê lekeyî û henekpêkirin e, kunekî ne. Nivîsa Kurdî ji bo xemlandinê ye, navên wan bi Kurdî ne, lê wekî din her tişt bi Erebi ye. Dema ku nivîsandina Kurdî qedexe bû, nivîsandina bi Kurdî şêrîn bû, lê dema ku derefet, pirtûk, rojname, malper, dibistan, televîzyonên Kurdî û gelek alavên din bi hêsanî û pîrbûn peyda dibin, şopandina zimanê Kurdî kêmtir dibe.

Ziman ji girîngtirîn mercên jîyanê ye, em rêzgirtina hemî zimanan digirin; zimanê kîjan milletî be bê guman ew cîyê rêzgirtinê ye. Cîhan bi giştî hevjinî serdema xwe dibe, gerek e ku em van rastîyan piştguh nekin, gerek e ku em ji ezmûnên zanistî sûdeyê wergirin, cîhan bi têgeha xwe tevlihev e, rengereng e û erkê her Kurdekî ye ku rengê xwe yê taybet di vê tabloyê de biparêze.

Parastin ne tenê ku yê çekdar sînorê welatê xwe ji dagîrkeran biparêze, parastin têgeheke bêdawî ye û ziman yek ji hêmanên wê yê girîng û sereke ne. Facebook bi qasî ku dîyardeyeke cîhanî ye, li ba me bûye cîyê nakokî û jihevduketinê. Polîtîk di wateya xwe ya dîrokî de ew şêwaz e ku ji bo lihevhatin û nêzîkbûnê ye, bi tenê li ba me polîtîk wateya wê windayî ye û di ser hemî kul û derdan de em polîtîkê bi zimanê bîyanîyan bi kar tînin; em bi zimanê wan bi peyvên wan bi hestên wan di torên medyaya civakî de afrêner in.

Tevî hemî bobelatan gerek e ku em geşbîn bin, tenê bi mandîbûnê hewldanên piçûk dibin ezmûn, ji ber vê sedemê em ê her tiştî bi hev re bi Kurdî bişopînin. Girişê me, kenê me, wê bi Kurdî be, tenê bi Kurdî.

LI BIN SÎWANEYA PIRSÊN BERAVÊTÎ



Ehmedê Huseynî

Di van kêlikên dîrokî yên dijwar û çarenûsane yên Rojava bi taybetî û Kurdistanê bi giştî de, li pêşberî xewnên mezin ên azadiya derengmayî, xwînên mezin ên leheng, qehreman û xweşmêrên dastan û afsaneyan, goristanên mezin ên şehîd, qurbanîyên reşekujî, teqîn, enîyên şer û berxwedanîyan, dilên mezin ên dayik û bavên êşên mezin ên vî welatî, rewşenbîrê Kurd çawan dikare rolan dabeş bike, berpirsiya xwe ya wijdanî û sincî bi cih bîne û di heman kêlikên dijwar ên dîrokê de nîrx û taybetmendî, hêvî û buhayîyên civaka xwe û wateyên rastîn ên pênasîya xwe, hem biparêze û hem jî di hişmendîya civakê de biçesipîne?

Bê guman, di demên şer û pevçûn û metirsiyan de, di kêlikên sosret û birînan de, di çaxên pirsgirêk û arîşeyan de, di hel û mercên ku êdî pîrsa nasnameya netewî û hewldanên dewlemendkirina wê û ber bi asoyên mirovane ve danasîna wê, di wan hemî deman de rola çand û rewşenbîran kûrtir û berfirehtir dibe û di çarçoveya pêkanîna erkên xwe yên dîrokî de, naçar in ku bi pirsgirêkên civaka xwe mijûl bibin û beşdarî çareserkirina hemî astengî û pirsgirêkên ku serî hildidin, bibin.

Ev beşdarî, dema ku li bin sîwana pênasîyêke rasteqîne bi rê ve here, anku li derveyî berjewendîyên takekesane yên teng û demkî, li derveyî jîholêrakirin û nepejirandina cihewazî û bîr û boçûnên din û li derveyî desthilata sîyasî û ramanên îdyolojîk ên cihêreng, wê demê yê rewşenbîr hem kesatîya xwe û hem jî berjewendîya giştî diparêze, tê dikoşe da ku hindêk têgehên zelal pêşkêşî civaka xwe bike, her wisa hewl dide ku bi

cegerdarî beşdarî avakirina dîmeneke xweşik a çand, ziman û kûrahîya nasnameya xwe bibe.

Wek ku çawan afirandin bûnewereke ramanî ye, wisa jî, rewşenbîr di çarçoveya hizr û hişyarîyê de bûnewerek e ku bi wijdanekî jîndar tev digere. Têkçûn û şikestinan, êş û azaran, şehîd û lehengan, her wisa, serkeftin û pêşveçûn, şahî û şadîmanîya neteweya xwe derdibire. Dîrokê ji bo nifşan dinivîsîne, hest û nestên netewî gur û geş dike, di ketinê de nav di xelkên xwe de dide da ku careke din rabin ser pêyan û serkeftinan bi dest xînin, li hemberî parçebûn û dabeşbûna xelkên xwe xwedî helwesteke tund û rasteqîne ye, alavên xwe yên derbirînê, ên peywendîyan, ên dan û sitendinê her û her hişyar dihêle da ku çavdêrê pêdiviyên nasname û heyîna neteweya xwe be. Ê rewşenbîr jî wisa tê dikoşe da ku bizavê li dijî rawestanê, rêjeyîyê li dijî rehagirîyê, zanînê li dijî nezanîyê, mentiqê li dijî demagojîyê û gelemperîyê li dijî takekesîyê bi kar bîne û di jîyana xwe ya rojane de, di dahênan, helwest û derbirîna xwe de, pasvan, xemxur û hostayê afirandina têgehên hevûdûpejirandinê, li hevûdûguhdarîkirinê, rêzgirtin û rehdaçikandina bîr û boçûnên cihêwaz û bergirîya mafê mirovan û rûmeta civakê dike.

Bawerîya rewşenbîr bi welatê wî heye, ji welatê xwe hez dike, dema ku hez dike, ne alîyên sîyasî ji bo wî girîng in, ne jî alîyên ku berjewendîyên xwe yên takekesane diparêzin girîng in. Dema ku dipeyive bi wijdanê gelemper ê neteweya xwe re dipeyive, berê qublenameya xwe ber bi paşeroja neteweya xwe ve dizivîrîne û ji neteweya xwe re bi hemî şêwazan radigihîne ku azadîya wî, ewlekarîya wî û yekîtîya wî pirsên sereke yên hebûna rewşenbîr in.

Îca rewşenbîrê Kurd ê ku a nuha li dîmenê temaşa dike ku çawan dikare van dîmenan, têgeh û boçûnan li qelem bide û çawan dikare di vê civakê de bi awayekî rasterast pênaseya xwe ya rewşenbîrane wergire?

Rewşenbîrê Kurd ê ku îro beşdarî avakirina dîmenê dibe û hewl dide ku di komel û civakê de xwedî rol be, bi çi alavan beşdarî dîmenê dibe, paşxaneya wî, perwerdeyîya wî û ji kîjan kargehê ber bi dîmena rewşenbîrîyê ve hatiye?

Rewşenbîrî wek têgeh, zeftkirina bareya afirandinê ye; afirandina

pirsan e û hetanî astekê jî avakirina bîr û bîranîn û bawerîyan û bi wêrekî dagirtina valahîyan û ronîkirina koşeyên tarî yên dîrokê ye, anku bikaranîna hişmendî û çalakirina sewîyetên têramandin û ramanê ye.

Çendîn mirovê rewşenbîr bikaribe pênaseya xwe biparêze û wê pênaseyê bi şeweyekî rasteqîne bi kar bîne, ewqasî beşdarî geşepêdayîn û pêşvebirina cîhana çandî, hunerî û ramanî dibe û xwenasîne teqez dike, her wisa derfeta wî çêdibe ku beşdarî seqa û gorepanên pirsên nûjen û pirsên hemdem; pirsên ku li çarenûsên nasnameyê, hebûnê û mirovatîyê digerin.

Dema ku em hewl bidin van çemk û têgehên, wek erkên serekane di jîyana xwe de û di hemî alî û warên civaka xwe de bi kar binin, bê guman, bi wê hewldanê re em ê hişmendîyê biafirînin, em ê hişyarîyê biafirînin û em ê der barê dîroka neteweya xwe de û rewşa wê ya îroyîn agahîyên nû û hin dîmenên teze biafirînin.

Hoker û mercên bingehîn ên vê hişyarîya rewşenbîrane ew in: Bîr û bîrewerî, nasname, çand, ziman, kelepûr û mîratgirîya dîrokî ye, li pêşberî çand, ziman û bişaftina dagîrkeran jî, xweçesipandn e, xwenasîn e û di hundirê taybetmendîyên neteweyî de li xwe temaşakirin û li der û dora xwe temaşakirin e.

Daxwaz û xwestek û hêvîyên ku vê hişmendîya rewşenbîrane dadimezirînin, peywendî ne; peywendîyên bi jîngehê re ne, têkilîyên bi demê re ne, têkilîya herî jîndar û dijwar jî ya bi penc û rêbazên ku em di hundirê wan de hatin bişaftin û talankirin re ye.

Dema ku em bizanibin ka em ji ku hatine û çî ji me hatiye dizîn û ka em ê çawan taybetmendîyên xwe ji talanan vegeirînin, bi tenê di wê kêlîka zanîne de, em dikarin bibin hêjayî wê pênaseyê, pênaseya bargiran û serêşane!!

Li vê parzemîne (ROJAVA) her kesji hev aciz e, her kes ji hev didexise, her yek dev diavêje yê din, her kes dixwaze yê din bike wekî xwe, her kes xwe wekî serkêş, pêşewa, bêmînak, afirênerê peyv û çandê dibîne, her kes bê hêvî, melûl, reşebîn û radestbûyî xuya dike, mebesta min ji “her kes” her kesekî rewşenbîr e!

Çi bi serê vê rewşenbîrîyê hatiye, tu kes nizane!

Li cem xelkê, di kêlîkên dijwar û metirsyane de, rewşenbîr çavkanîyên hêvî û ûmîdan in, çunkî hebûn û berdewamîya nivîsandin û dahênanê li ser zeftkirina rehên hêvîyan tên çesipandin, anku rewşenbîrekî bê hêvî, bê xewn; çawan dikare der barê nîgaş û hêma û fantazyayê de bipeyive?

Li şûna ku yê rewşenbîr bi pirsên mezin mijûl bibe, bersiva hindêk pirsên giran ên dîrokî bide û li şûna ku bizanibe ku afirandin rexne ye, afirandin cemawer e, afirandin kelepûr û mîratgirî ye, afirandin azadî û nasname ye, afirandin evîn û dilsojî ye, afirandin welat û netewe ye, em wisa dibînin ku bi tiştên sivik û bêwate mijûl dibe. Bi filan kes û bêvan kes mijûl dibe, bi vê rêxistinê û wê rêxistinê mijûl dibe.

(DIDOME)



Ji ser şaxê herî jor yê dara li ber mala wî, li bajarê Düsseldorf ê Almanyayê, laşekî serjêkirî hat xwarê û ket ber lingên wî. Ew veneciniqî û li jor jî nenêrî. Bi xwîneke sar li kolana ji xelkê vala û tije tirimpêlên sekinî nêrî û çavên xwe li serîyê vî laşê ku ketibû ber lingê wî gerandin. Bentelonê mêrik mîna bentelonê wî yê jênz bû û ew jî difikirî ku îro gumlikê xwe yê sipî yê mîna gumlikê vî mêrikê serjêkirî li xwe bike. Ji ber vê, dixwest ku navê vî mêrikê serjêkirî nas bike.

Dîtina laşekî serjêkirî nema bandora xwe lê dikir, nexasim ku wî di rêya internetê re, rojê bi dehên vîdyoyan didîtin ku tê de dîmenên serjêkirinê hene. Wisa di ber xwendina sûretên Quranê re dibû xuşexuşa pêlên xwînê, wisa jî piştî şahîya kuştinê laşên merivan li erdê bêdeng û di nav xwînê de bê liv û lebat diman. Eynî mîna vî laşê ku rêya malê li ber girt û nuha jî pê ve mijûl e. Nikare wisa dev jê berde û bi rêya xwe de here. Bilez têkeve hundir, here ser cihê xwe, lihêfa xwe biavêje ser serê xwe û wek ku tiştek nedîtibe, têkeve xeweke giran. Hat bîra wî ku ev zêdeyî bîst salî ye ku ne li Sûrîyeyê, li cihê hatina wan vîdyoyan dijî lê li Almanyayê ye. Her weha dîtina laşekî serjêkirî li vê derê li kolanê ne tiştekî ewqas normal e. Li gorî awayê jîyana vê derê Diviyabû telefonî polîsan bikira, lê wî nekir.

Valabûna kolanê ji xelkê ew li vê yekê germ kir, ku ew bi xwe çareyekê ji vî laşê serjêkirî re bibîne. Gava hat bîra wî ku ev yekem car e destên wî digihêjin laşekî mirî, tirsîya. Tevî ku di rêya televîzyon û vîdyoyên internetê re di van sê salên dawîyê tenê de dîmenên bi hezarên mirîyan dîtine. Wek

ku ew nav û wêneyên kesên ku wek şehîd dihatin binavkirin û bi hezaran di ber çavên wî re derbas bûne, xeyal bin. Her wêneyekî nû dihat, ew wek şehîd oxir dikirin, çend seet diçûn wêneyekî nû û navekî nû dihat û yê berî xwe dida jibîrkirin û her wisa xelekeke girover bû û digerîya. A nuha jî rû bi rû li ber laşekî serjêkirî, laşekî rastî ji goşt û xwînê, rawestîyaye û nizane çî bike. Ji nişkê ve tirsîya, hat ber çavên wî ku serê wî mêrikê mirî li laşê wî vegere, rabe ser her du pêyan û jê bipirse ew çima radihêje wî û dixwaze wî bi xwe re bibe hundir. Ji ber vê, hetanî ku laşê bêserî hilgirt di nav xwêdanê de mabû. Ew bi xwe re bir hundirê mala xwe ya ku ew tenê lê dima. Li orta oda xwe ya mezin ew dirêj kir.

Ji ber xweşikbûna vî laşî û tunebûna xwînê û bermayiyên şerjêkirinê şaş mabû. Termekî weha bêdeng bû, wekî ku kesekî dest nedabê. Ji rastîya vê bûyera ku bi çavên xwe dibîne ket gumanê. Hat bîra wî ku wî di xewnên xwe yên berê yên mîna kabûsan de gelek laş dîtine.

Sîh salî li welatê xwe yê berê jîyabû, tevî kêmbûna bûyerên kuştinê ku diqewimîn, lê dîsa jî wî gelek mirî û kuştî di xewnên xwe de didîtin. Tiştê ew şaş hiştibû ew bû, tevî ku welatê wî yê berê bi hezarên kîlometran jê dûr e, lê ji qasê ku şoreşê, wek ku xelk wê bi nav dikin, dest pê kiriye, ew nema kabûsan dibîne. Tevî ku malwêranîyê, xerakirina mezin, sedhezaren kuştîyan û milyonên mişext û penaberên li her deverên dinyayê belav bûbûn, ew bêzar kiribû.

Bahoza van bûyerên ku li welatê wî yê berê qewimîbûn ew vegerandibû tax û kolanên wan bajarên dûr ên ku ji berî bîst salan, li pey xwe hiştibûn. Di vê dema dawîyê de bûbû mîna mekîneyeke hesabkirinê. Ne tenê laşên ku di şerê kolanan de diketin, lê belê yên ku ji bin kaviîlên avahî û malên xerabûyî jî derdixistin, dihejmartin. Lê wisa ku laşekî serjêkirî ji jora dara li ber mala wî bikeve ber lingên wî û li Almanyayê, ev yek qet bawer nedikir. Ew bixwaze nexwaze, tiştêkî wisa hat û bû û divê ew di kurttirîn dem de çareyeke bilez jê re bibîne. Nexasim ku wî nuha jî nas kir ku êdî meseleyeke rasteqîn e û ne xeyal û ne jî xewn in. Hestên tevlihev ew bir û anî. Ji alîyekî de ew bi xweşikbûna laş daketibû û ji alîyê din jî ve ew ditirsîya ku ev laş xera bibe, bêhn pê keve û her tişt eşkere bibe. Dibe ku polisê vê cînayetê têxin hustê wî, an jî wî bi veşartina cînayeteke ku li ber derîyê wî çêbûye tawanbar bike. Dizanîbû ku wê cîranê wî yê Sûrî tenê karibe jê fêm bike. Ma ku xwe biavêje hewara wî. Bawerîya her duyan bi hev dihat. Carê behsa welatê xwe dikir, nûçeyên wî dişopandin. Mîna du çavdêrên bêçare li benda guhertinên wî welatî bûn. Ewê ku li paş xwe hinştibûn û ji her çar alîyên cîhanê cîhadîyên xwedîyên kêrên serjêkirinê

berê xwe dabûnê. Wisa jî şervan, partî, êl, mezheb û hetanî bi balafirên şer ên mezintirîn dewletên dinyayê.

Hemû dijmin ji her aliyê cîhanê li wî welatî derdiket nêçîra dijminê xwe. Cîranê wî pê ve hat. Laşê serjêkirî yê ku li oda cîranê wî yê rûzerbûyî li ser piştê dirêjkirî bû ew vecinîqand. Cîranê wî bê navber axivî û ew di nav pirsan de hişt. Her tişt li ber çavên wî ketibû nav mij û xumamê. Tiştêkî mîna xeweke giran nedihîşt ku her du çavên xwe veke. Gava her du çavên xwe vekirin, dît ku li ser textekî paqij yê nexweşxanê dirêjkirî ye û cîranê wî pê re diaxive. Gava bi ser hişê xwe ve hat, ji cîranê xwe tê gihast ku ew li malê ji ser hişê xwe çûye û cîranê wî ew bi tîrîmpêla xwe anîye nexweşxanê. Li benda wê yekê bû, ku cîranê wî jê re bibêje; êdî mesela wî laşê serjêkirî hemû xewn û xeyal bû, lê wî tiştêkî din bihîst. Cîranê wî dilê wî dixist di cih de, ku ew laşê serjêkirî bi alîkarîya hin kesên din ên Sûrî hatiye veşartin û hemûyan bi hev re mesref û lêçûna cenazeyê daye û her tişt bi selametî derbas bû. Tevî ku ew mêrikê serjêkirî hezkirîyê ber dilê her kesî bû. Ew awayê ku cîranê wî pê behsa xwediyê laşê serjêkirî dikir, nîşana wê yekê bû ku her kes wî mêrikî nas dike. Yekser li nasnameya mêrikî pirsî:

- We çawa ew nas kir?

Serê xwe bi xemgînîyeke mezin hejand:

- Naskirina wî ne wilo zehmet bû.

- Ewê ha kî bû?

Cîranê wî bi bişirîneke xemgîn bersiva wî da:

- A rast tu bipirsî, ewa ha kî bû?
- Ji bo Xwedê, bibêje, ez nema hedar dikim.
- Erê, ji ber vê divê tu destpêkê ji nexweşxanê derkevî.

Bêhna wî ji reva cîranê wî ya ji bersivê teng bû. Xwest ku dîsa pirsê xwe dubare bike. Cîranê wî gotina xwe ya dawî got:

- Ez soz didim te ku dema ku em ji vir ber bi goristanê ve herin, tu yê nav li ser kêla gorê bixwînî.
- Na xwe em nuha herin.

Bi vî awayî cîranê wî ew ji nexweşxanê derxist û wan berê xwe da goristanê. Bi rê de pirsên tûj ew dabûn ber kêran:

- Gelo ew kî ye ku cîranê wî wilo naxwaze navê wî yan navê wê bibêje û çima wisa ji bersivê direve û çima ew ê herin goristanê! Gava ku bi cîranê xwe re derbasî nav goran bû, gorên dê û bavê wî hatin bîra wî. Dê û bavê ku dema her du li wî bajarê wî yê jibîrbûyî yê welatekî wêrankirî serê xwe danî û mirin, ew li xerîbîyê bû. Cîranê wî lê zîvirî û berê wî da goreke wisa xweşik ku li bejin û bala wî laşê xweşik dihat:

- Gor ev e.


Bi du çavên xemgîn û tije mereqdarî hevoka ku li ser kêla gorê nivîsandîbû, xwend:

- Ev gora Şoreşa Sûrîyeyê ye - Elfatîha.

Bi zorê dikarîbû serê xwe hilde û her du çavên xwe yên tije şikestin li cîranê xwe bigerîne. Li nav goran ne cîranê wî û ne jî kesekî din xuya nedikir.

Ew goristana ku navê wê cîhan e, vikî vala bû û ji her demê bêhtir rût û repin bû.

George Orwell



Pîyalek çaya xweş

Werger: Azad Ekkaş

Heke yekem pirtûka xwarinpêjane bikeve di destê te de û tu tê de li peyva "çay"ê gerîya, dibe ku tu bibînî ku ev peyv tê de peyda nabe; an jî tu yê pir pir rastî çend xêzîkin serveyî yên ku tu rêbazan ji bo xalên herî girîng danahînin werî.

Ev yek, tişteki gelekî balkêş e, ne tenê ji ber ku çay li vî welatî yek ji sitûnên sereke yên şaristanîyê ye, her weha li Eire, Awustralya û Nyuzîlandê, lê belê ji ber ku şewaza herî baş ji bo çêkirina wê cihê nakokîya herî tund e.

Dema ku ez di ser terîfa xwe ya pîyala çayê ra bêtêmasî re diçim, qet nebe ez yazdeh xalên cihgirtî dibînim. Li ser ne kêmtirî duduyan ji wan lihevkirineke giştî heye, lê bi kêmanî çarên din cihê got û bêjên germ in. A li vê derê jî yazdeh rêbazên min in, her yeka wan li ber dilê min zîv û zêr e:

Berî her tiştî, divê mirov çayeke Hindî yan jî Sêlanî bi kar bîne. Çaya Çînî xwedî hin qencîyan e divê mirvo îro bi çavekî piçûk li wan nenêre - ew

erzan e, û mirov dikare wê bê şîr vexwe- lê ew mirovê ku ewqas tev nade. Mirov li dû vexwarina wê xwe ne baqiltir, ne wêrektor ne jî çakbîntir hîs dike. Çi kesekî ku berhevoka "Pîyalek çaya xweş" bi kar anîye, her û her çêla çaya Hindî dikir.

Tiştê duduyan, divê hindikek û bi pîvan çay were çêkirin, anku di çaydanekê de. Çaya ji qazan her tim bê çêj e, û çaya leşkerîyê, a ku di qadûkan (qasik) de tê çêkirin çêja don û aravê jê tê. Divê çaydan ji ferfûrê yan jî ji herîyê çêkirî be. Çaydanên zîvî yan jî amêjenîya Brîtanî, çayeke kêmkalîte didin û çaydanên mînakirî hê xirabtir in; tiştê balkêş ew e ku çaydanên pîlekirî -ew jî kêmtên dîtî di van rojan de- ne ewqas xirab in.

A sisêyan, divê çaydan ji berê de hatibe germkirin. Ji bo vê baştir e çaydan li ser agirê gazê bê danîn ne ku li gorî rêbaza asa anku avekî germ lê bikin.

A çaran, divê çay giran be. Ji bo çaydaneke yeklîtreî, heke tu dikî heta kevîyê tijî bikî, şeş kevçiyên çayê yên lodkirî dê hema hema lê werin. Di dema behreyên radekirî de, ev ne ramanek e ku mirov bikaribe di her rojekê hefteyê debi cih bîne, lê ez her li ser wê yekê me ku pîyalek çayya giran ji bîst pîyaleyên sivik çêtir e. Heyranên çayê yên rastqîne, ne tenê çaya giran ji xwe re hez dikin, lê bi buhurîna salan ve piçekî ji girantir hez dikin. Ev jî rastîyeke pesendkirî ye ku bi rêya wê behra mezintir ya ku ji xanenişînen pîr re tê terxankirin.

A pêncan, divê çay rasterast di çaydanê de bê werdan. Parzûn, kîsikên mûslînê yan jî çî alavên din ên ku çayê hefs bikin, nebin. Li hin welatan çaydan bi selikeke li binîya asta lûleyê hêl dibe tîn, da ku pelikên serserî bigire, qaşo bi zîrar in. A rast, mirov dikane hindikekî maqûl ji pelikên çayê bixwe bêyî ku tu nîşaneyên nexweşîyê xuya bikin, û heke çay di nava çaydanê de ne serbest be, reng û tehma xwe hîç xweşik venade.

A şeşan, divê mirov çaydanê ber bi kelînerê ve bibe ne wekî din. Divê av bi rastî di kelê de be dema bandorlêdanê, anku divê kelîner li ser êgir be dema ku mirov avê jê berdide. Hin kes lê zêde dikin ku divê mirov tenê aveke teze hatiye kelandin bi kar bîne, lê min hîç bala xwe nedaye ku evê han tu ferqî dixê meselê.

A heftan, piştî çêkirina çayê, divê mirov wê tev bide, an jî ya hîn baştir ku yek çaydanê xweşik bihejîne, dûre bihêle pelik rûnin.

A heştan, divê mirov bi pîyaleke taştêyê ya baş vexwe, ew jî ya lûleyî ye, ne ji yên pehn û kinik. Pîyala taştêyê bêtir çay dikevê, lê bi cûreya din, çay timî nîvsar e û hîn mirov devê xwe pê xweşik şil kiribe jî.

A nehan, divê mirov qeymaxê ji ser şîr bigire berîya ku ji bo çayê bi kar bîne. Şîrê ku rûnê wê zêde ye her tim çayê tamsar dike.

A dehan, divê mirov pêşî çayê berde pîyaleyê. Ji nava hemîyan, ev xala herî bi nakok e; bi rastî di her malbateke Brîtanî de dibe ku du dibistanên hizirî li ser vê mijarê hebin. Dibistana pêşî-şîr dikare hin palpiştên baş bihêz bîne, lê ez tekez dikim ku kes nikare bersiva palpiştê min bike. Ew jî wilo ye, dema ku mirov pêşî çayê tê dike û lev dixê dema ku şîr bi ser de ber dide, mirov dikare qasa şîr bi dîqet eyar bike, lê li aliyê din belkî mirov zêde şîr têkê heke li gorî şêwaza din biçe.

A dawî, divê çay -heke mirov bi şêwaza Rûsî venexwe- bê şekir bê vexwarin. Ez li vir baş dizanim ku ez ji nava kêmyatîyekê me. Lê dîsa jî, hele tu çawa dikarî xwe wek heyranê çayê bi nav bikî, heke tu tehma çaya xwe xira dikî bi wî şekirî tu tev lê dikî? Bi heman mentiqê bila mirov bihar an jî xwêyê tev lê bike. Mebest ew e ku çay tehl be, tam çawa divê bîra tehl be. Heke te ew şêrîn kir, tu êdî tehma çayê jê nagirî, tu tenê şekir tehm dikî; tu dikarî vexwarineke gelek nêzîk amade bikî bi helandina şekir di aveke zelal a germ de.

Hin kes dê bersiv bidin ku ew ji çayê bi xwe hez nakin, û wê vedixwin tenê da ku xwe germ û çalak bikin, û pêdivîya wan bi şekir ve heye da ku ji tehmê xelas bibin. Ji wan kesan re, li pey rêbertîyeke şaş ketine, ez ê bibêjim: Biceribînin ku hûn çayê bê şekir vexwin, em bêjin ji bo maweya du hefteyan û dê ihtîmal gelek kêmbê ku hûn careke din çaya xwe bi rêya şêrînkirinê xira bikin.

Xalên sebarek bi vexwarina çayê yên ku cihê lihvnekirinê ne yên ku behsa wan were kirin ne tenê ev in, lê ew bes in da ku xuya bikin bê ev mesela han bi giştî gihastîye ku. Reftara cîkavî ya razdar jî heye li der û dora çaydanê (çima çepel tê hesêb tu ji binpîyaleya xwe vexwî, bo nimûne?) û gelek tişt dikarin li ser bikaranînên binserekî yên pelikên çayê bîn nivîsîn, wek falvekirin, pêşbînîya hatina mêvanan, êmkirina kerûşkan, dermankirina şewatan û paqijkirina mehfûran. Hêja ye ku mirov bala xwe bide van hûrgilîyan dema ku çaydana xwe germ dike û ava bi rastî dikele bi kar tîne, da ku mirov baş tekez bibe ji behra xwe ve wan bîst pîyaleyên çayê yên giran der bîne, ewên ku wan du onseyên çayê dinimînin heke bi awayekî rast li ser hat xebitîn.

[Kovara Rojava][Hejmar(0)] [Sala2018'ê] [Weşanên HRRK'ê]

Jêder: *The Collected Essays, Journalism and Letters of George Orwell*, Volume 3, 1943-45, Penguin ISBN, 0-14-00-3153-7

- Navê Galîkî ya Îrlandê; navê fermî ya Komara Îrlandê (1937–49). [werger].
 - Amêjenîyeke (xelîteke) ji madenên: qilê, antîmon û misê pêk tê. Ji bo çêkirina firaxan gelek tê bikaranîn. [werger].
 - di deqa orîjînal de “quart” e, yekeyeke pîvana şileyên ya Bîrîtanî, çarîka galonekê ye, anku yek lître ye. [werger].
- Yanî bi fermî mafê her kesekî tenê qaseke radekirî (sabit) ji hin keresteyan bistîne. [werger].
- Bi semawer tê amadekirin, bi şekir, hingiv an jî rîçalan tê şêrînkirin. [werger].
 - Onse: Yekeyeke giranîyê ya Bîrîtanî ye, nêzkî 28 gr e. [werger].



KAUF LAND

Ahmedê Xursî
ÇÎROK

Kaufland firoşgehek e ku li hemî bajarên Almanayayê heye, a bajarê min jî, li serê koşeyê ye, carcaran ez li wir pêrgî wî tîm, ji sedî sed dizanim ku ew mirov Kurd e, û her car jî heman ew tûrikê ji çapan ê sipî di destê wî de ye û heman desmalka hirî li dor hustê wî ye, her gava ku ez silavê lê dikim, silava min venagerîne, tenê di rûyê min de dimizice û ji ser min dadigere.

Çendîn xwîna wî mirovî bi min şêrîn e, dibe ku bavê min tîne bîra min, lebata wî hinkûfê bavê min dide, temenê wî nêzî heftê salî ye, lê hîn jî bi sêngê dimeşe.

Berî ku li cadê bizîvire, li min jî dizîvire, cardin bê mad dimizice û diçe, kesereke mezin di sînga min de dihêle, gelo vî kalemêrî çi êş û azar li vê penaberîyê kişandiye, ku wisa bê deng dijî?

Vê carê min çiqasî dixwest ku ez dengê wî bibihîsim, min hîn hemî hewcedarîyên xwe nekirîbûn, min da pey wî û ez li dû wî li ber qaseya jimaryar rawestîyam, lê mixabin bi wê re jî neaxivî, tenê deh euro ji xelîtka xwe derxistin û da destê keçika qasê û bersiva wê bi serê xwe da, anku min bon navê û meşîya .

Min biryar dabû ku cara bê ez ê bidim dû wî û xwe jê veşêrim, ta ku ez mala wî nas bikim, lê mixabin ev demeke dirêj ku ez nema wî dibînim, ji mereqan dikim ku bibeicim, çima nema dixuye, elo ma mir an mala xwe ji vî bajarî bar kir!

Bi dehê caran min pirs ji kurdên bajar kir, min çendîn ji wan re dirûvê wî li bîra wan dianî; min digot ku zilamekî kal bû û her gav

desmalkeke hirî li dora hustê wî xwe dibada û destikê berçavka wî pan bû û her cara ku dihatim vê firoşgehê min ew didît, lê sosreta mezin ku tevan digot me tu carî mirovekî weha li vî bajarî nedîtiye, gelekî xemgîn bûm ku min ew mirov winda kir.

Ev serê pîst salî ye ku min tu carî wek vê evarê bêriya wî nekiribû, rabûm ser xwe, min berê xwe da firoşgehê. Xet bi xet li nav refikên firoşgehê gerîyam, min rûdêmên hemî mirovên li wir nêrî, lê yek ji wan jî nedişibihî wî, ez polîpoşman vegerîyam ber qasê, min deh euro ji xelîtka xwe derxistin, danîn ser maseya keçika jimaryar, min alavên xwe xistin tûrikê xwe yê ji çapanê sipî û min serê xwe hejand, anku min bon navê, di rûyê hemû kesan de mizicîm, û min hêdî hêdî qurzîya cadê li xwe bada.

2018

ALMANYA

Eyşe Şan



Xanima bêtac û text
(1938 Amed - 18.12.1996 Izmir)

Kakşar Oremar



Di dîroka serhildana çand û hunera Kurdistanê de, yek ji wan hunermendên ku li dijî sîyaseta çewt û asîmîlasyona reş û bi hêza Kemalîstan li Bakurê Kurdistanê mîna şêrejinekê li ber xwe da, Eyşe Şan bû. Eyşe Şanê bi wî dengê xwe yê şilik û nazik, bi wan kilamên xwe yên resen, gotina bav û kalên me anku (şêr şêr e, çi jin çi mêr e) di çax û serdemekê de da isbatkirin ku komara stemkar a Tirkîyeyê xewna qikirina gelê

Kurd û hemû taybetmendîyen kulturî û çandî yên Kurdan, deqîqeyekê jî ji serê xwe dernedixistin.

Eyşe Şan ku di nava civata Kurdistan de bi navên mîna Eyşana Kurd, Eyşe Şan, Eyşe Xan, Eyşana Osman, Eyşana Elî û Ayşa Şan tê nasîn di Mijdara sala 1938an li bajarê Amedê hat dinê. Ji alîyê dê û bavê xwe ve, xwedî malbateke mezin û navdar e. Navê dêya wê Hecîye Xanim û ji êla Hacî Mistefa Begên Erzromê ye, navê bavê wê jî Osman e û ji eşîreta mezin a Cibrîyan e. Bavê Eyşe Şanê Osman bi xwe jî dengbêjekî navdar û her weha mirovekî gelek dîndar û xwedêtirs bû.

Di nava Kurdistan de hunera dengbêjîyê mîna kanîya avê bêdawî ye, her tim dizê û naçike. Dengbêjên Kurd di vê navê de bandoreke mezin li hestê hunerî yê Eyşe Şanê lîstiyê, ji ber ku her dem dîwanxaneya mala bavê wê ji dengbêjên herêmên cûr bi cûr ên Kurdistanê tijî bû. Li mala wan dengbêjên dengxweş didan ber hev û tev bi hev re heya roja din berê sibê distra. Di vê navê de dengbêjê ku ji her kesî dengxweştir û hostatir dawîya tevan derketa, ji alîyê xwedîyê dîwanê ve xelateke hêja distand û her kesî ew pîroz dikir. Ev 'edeta qenc bi hezarê salan e ku hê jî di nava Kurdistan de didome û bi taybetî ji giregirên Kurdistan; Axa û Begên xwedî gund her dem derîyê kûşk û dîwanxaneyên xwe ji dengbêjên Kurd re vekirî hiştine û malên wan bûne xwendingehêk ji bo bihêzkirina edebîyata devkî ya Kurdistan. Dema ku mirov jîyana dengbêjê mezin Evdalê Zeynikê dixwîne baştir bi vê rastîyê dihese. Ji ber ku Evdal bi piştgirîya maddî û me'newî ya Sûrmelî Mihemed Paşa bêtir di karê xwe de bi ser dikeve. Osmanê bavê Eyşe Şanê jî ev karê bav û kalên xwe li gor hêza xwe didomanid. Dayika Eyşe Şanê Hecîye Xanimê ji carinan bi lorikên ku ji wê re dixwendin, rihê wê y; tiî hest û hisên hunera kurdewarî dixist bizav û hereketê.

Dema ku dengbêjên Kurd di mala bavê Eyşe Şanê de li dora hev dicivîyan, Eyşe Şanê jî ji wan çaxên biqîmet mifa werdigirt û bi heval û destexuşkên xwe re li piştê derîyê dîwanxanê heya berê sibê rûdinişt û bi evîneke kûr li dengê sitranbêj û dengbêjên mêvan guhdarî dikir. Eyşe Şan carinan bi bîhîstina dengê wan mest û mendehoş dibû û haya wê ji dinyayê nedima. Ew dibû Zîn û li Cizira Botan bi Memê Alan re dipeyvî, carinan jî ew dibû Xecê û li serê Çîyayê Sîpanê Xelatê bi Sîyamendê Silîvî re di geşt û gulzaran de digerîya. Daneberheva dengbêjê mezin ê Kurdistanê Evdalê Zeynikê û Gulêya Ermenî wek ku careke din jê re zindî dibûn. Bi deng û naveroka sitranên dengbêjên Kurd serbihurîya Derwêşê Evdî û Edûlê, mîna rêzefilmekê li ber çavên wê zindî û derbas dibû. Eyşe Şan li ser vê yekê dibêje: "Xwezîya der û dîwarên mala bavê min bi ziman bûna ku ji we re behsa wan roj û şevan bikirina, erê, ez her tim bi hesret dibêjim xwezîya zimanê dîwarê mala me ya li Amedê hebûya ku ji me re qala wan şevbêrkên dengbêjan bikira. Min di quncikan de li dengbêjan guhdarî dikir. Min wisa guhdarî dikir ku yekî gazî

min bikira, ez ê vecinîqîma. Dengê bavê min ê zîz û xemgîn teîsîrek mezin li min dikir. Sal diborîn lê dengê wî ji guhê min derneket”

Sala 1958an, keça Kurd Eyşana hunerdost û dengnazik bo yekemîn car di nava civata jinan de sitranên ku ji ber dengbêjên mîna bavê xwe digire, carinan distire. Her kes bi bîhîstina dengê wê bi hesret guhdar dimîne û bi vî rengî hunermenda nemir dest bi sitrana kilamên cima’eta Kurdan dike.

Malbata Eyşe Şanê pir dîndar bû, her kes bi xwendina Qûranê mijûl dibû, lê di nava dengxweşên xwendina Qûranê de jî, Eyşe Şan zora tevan dibe û dikeve rêza yekemîn. Lê ew evîndara sitrana Kurdî ye û li her derê di nava kom û civatên xwe bi xwe de bi lorik û besteyên xwe xem û şahîyan di nava dilê mirovên derdora xwe diafirîne.

Eyşe Şan di despêka xuyabûna hunera xwe de ji aliyê bav û birayên xwe ve rastî nerazîbûnan tê, bavê wê ji bo jin û keçan sitranbêjîyê gunehekî mezin dihesbîne û li gor şerî’eta Îslamê dengê jinê ji bo sitranbêjîyê haram û guneh dizane. Dema ku ji bavê Eyşe Şanê tê xwestin ku çend sitranên xwe li kompanîyekê tomar bike, ew bi xwe jî pêşniyaza pilakçîyan ya ji bo amadekirina kasêtekê napejirîne, lê Eyşe Şan bi hemû zehmetî û kultura paşverotîyê ya li dijî xebata hunerîya jinan, li ber xwe dide û dixwaze ku ew jî bi dengê xwe ji civata xwe re xizmetekê bide meşandin.

Bûyereke tal di jîyana Eyşe Şanê de ew ji ezîztirîn kesên wê dûr xist. Eyşe Şan hê 20 salî bû ku li ser daxwaza bavê xwe bi xortekî yê bi navê Şewket Tûran re zewcî. Her çend ew xwedîyê keçekê jî bûn, lê ew li hev nehatin û Eyşe Şan piştî vê bûyera nexweş hat bajarê Entabê. Wê dev ji keça xwe ya sêmeî û hemû kes û karên xwe berdabû û ji bona wê hindê jî xerîbîyê di rewşeke weha de bandoreke gelekî xirab li ser jîyana wê dikir. Li Entabê wê bi hezar zehmetîyan û bi karê pînekkirin û dirûtina kincên qetyayî debara jîyana xwe dikir. Eyşe Şanê bi hevkarîya zilamekî yê bi navê Naîl Baysû du salan li radîyoya bajarê Entabê bi zimanê Tirkî sitran gotin. Lê ji ber ku di dilê Eyşana Elî de evîna sitrana Kurdî heye, wê ji karê di radyoya Entabê

derdixin. Piştî Eyşana Kurd hat Istenbolê û bo cara yekê bi zimanê Kurdî û Tirkî sitranên xwe dan tomarkirin. Lê xwedîyên plakan (sêlik) mafê wê yê rastîn nedayê û bi firotina kasêtên wê bûn xwedîyê her tiştî. Wê jî her çend bi dengê xwe yê xweş dikanî bibe xwedîya her tiştî û pir dewlemend bibe lê bêdadîya xwedîyên kompanîyên kasêtomarkirinê, mafê wê nedidayê û ew her tim feqîr û bêkes bû. Bi salan keda wê hat xwarin, ji bona wê jî Eyşe Şanê ji ber vê

[Kovara Rojava][Hejmar(0)] [Sala2018'ê] [Weşanên HRRK'ê]

bê'daletîyê gelek xem dikişandin. Ji alîyekî din ve jî ew bi rastîya ku sîstema Cihûrîyeta Tirkîyeyê hebûna li Kurd û Kurdistanê mikur nayê û zimanê Kurdî jî qedexe ye hesîyabû û dema ew ku li gor zagonên sîstema Kemalîstan pêngavan hilnegire, mafê wê jî yê mîna mafê 25 milyon Kurdên Bakurê Kurdistanê bê xwarin û pêpestkirin.

HEVPEYIVÎN



Eugene Ionesco

1912- 1993

Ev hevpeyivîn di sala 1990î de ji alîyê hemwelatî E. Ionesco, mamosteyê felsefeyê yê Zankoya Boxaristê Gêbreyal Loşyano ve hatiye kirin. Hevpeyivîn di kovara Fransî ya bi navê (Kovara Rewşenbîrî) de li gel çend nivîsarên E. Ionesco yên nebelavbûyî û çend (xewnên) ku Andre Kotan li ser E. Ionesco di pirtûka (Perçeyên Bêdengîyê) de berhev kirine, hatiye belavkirin. Bê guman ev hevpeyivîn a E. Ionesco ya dawî ye. Ê xwendevan dikare Ionescoyê mirov di rojên dawîn de nas bike. Dikare tirsê wî, lerzê wî, lixwemukurhatin û pendên wî hest bike.

Pirs: Hemî çalakîyên te, bi peyva te ya navdar (NA)ya ku serîhildan e, hatine naskirin. A nuha hevpeyivîna te ya sala 1986ê ya di gel Monîka Lovnisko ku li ser (Na)ya te ya taybet bû; tê bîra min. Wê çaxê te bahaneyê xwe bi vê hevokê anîbû

zimên: (Ez serserî bûm). Lewra dixwazim ku bipirsim ka hetanî kîjan sînorî bandora vê (serserîtîyê) hem li ser berhemên te û hem jî li ser jîyana te bi giştî hebû. Ma em dikarin wan bi helwestên te yê bergirîya li hemberî hemî pirsên têkçûyî ve girê bidin, cihêwazîyên di navbera te û nivîskarên Romanyayê de; mebesta min nîfşê navbera her du Şerên Cîhanî ye, çi ne? Bi taybetî di navbera te û her du hevalên te Sioran û Ilyad ên ku xwe pir diparastin. Lê tu bi xwe bi awayekî bêminak; bêtirs û dudilî, ber bi sînorên rastîyê ve çûyî, ma gelo sedemên vê yekê (serserîtî) bû?

Bersiv: Dibe, dibe ku wisa be. Lê ji bo rastîyê, ev helwest beşek bû, tu carî ji xwerista min a rastgo cihê nedibû. Ez bi xwe wek ku Bodlêr dibêje: (dilê xwe rût pêşkêş dikim). Ji bo rêzgirtina rastîyê gerek mirovê ku bawerîya xwe bi rastîyê bîne hemî metirsîyan dahîne alîyekî, ji ber ku rêzgirtina hestên taybet an jî hestên xelkê bêrûmetkirina rastîyê ye.

Pirs: Ji bo min rastî tiştê reha (mutleq) ye, û nivîskarê ku bixwaze di çarçoveya pirsgirên giştî de bikaranîna rastîyê ron bike, ji helwestên rût ber bi sîyasetê ve diçe, ma nakokî di navbera wan de peyda nabe?

Bersiv: Di bawerîya min de gerek pevgerêdanek di navbera rehayî û rêjeyîyê de hebe. Lewra gerek ê nivîskar ji demekê heta demeke din ji keleha xwe derbiçe û dakeve kolanê.

Pirs: Di çarçoveya helwestên te yê li hemberî civatê û pirsên giştî yê cîhanê de, tê bîra min ku tu li dijî çepên Fransayê rawestîyayî, di heman demê de bi navê çepîtîyê tu li dijî faşîzma li Romanyayê radiwestîyayî, tu vê yekê çawan şîrove dikî?

Bersiv: Dîsa ji bo rêzdarîya rastîyê bi xwe, min her tişt bi nav dikirm, ji ber ku çepîtîya dijwar bi xwe faşîzmeke cihêreng di xwe de vedişart. Di gel ku min bi ronîkirina çend rastîyan; gelek xelk ji xwe xeyidandine; xelkên ku xwe nas nedikirin û nikarîbûn dawîya rêça ku hilibijartîye û her weha metirsîyên wê rêçê, bibînin.

Pirs: Min hevpeyvîna xwe bi serîhildana te ya ku di peyva (Na)yê de bi cih bûbû, dest pê kiribû. Ew serîhildan li dijî sîyaseta bêmirês a di navbera her du Cengên Cîhanî de bû. Lê dixwazim ku bipirsim gelo te çawan karîbû di şanoyên xwe de wê serîhildana li dijî sîyasetê bikî serîhildana li dijî mercên ku mirovan dagîr dikin. Reng e ku li vir destpêka peywendîya cihêreng a bi bîr û bawerîya olî re be. Bi alîkarîya vê serîhildana li dijî sîyasetê, tu çawan pêrgî Xwedê bû?

Bersiv: Ez nizamim, ma gelo pêrgî Xwedê bûme, bi rastî jî ez nizamim, ji ber ku hê jî lê digirim.

Pirs: Lê pirsên pirtûka te ya dawîn pirsine mîtafîzîkî ne. Ji bilî hevpeyivîna bi Xwedê re nayê şîrovekirin, ma wê çi be, bi taybetî dema ku tu dipirsî: Ma gelo li dawîya rê, tu kes bendemana me dike?

Bersiv: Ev pirs min dilerizîne; pirsra pirsan e.

Pirs: Tu bawer dikî ku hemî berhemên te hevpeyivîna li ser vê bendemanê ne?

Bersiv: Ez bi xwe di hebûna Xwedê de gumanê hildibijêrim, a rastir ew e ku demên gumanê li cem min, ji demên bawerîyê dirêjtir in. Di vê kêlîkê bi xwe de, ku bi te re dipeyivim, nikarim bibêjim ku sedî sed bawerîya min pê tê yan na. Di gel ku daxwaza bawerîyê di hinavên min de pir xurt e jî. Hevalekî min ê Keşe heye, her ku diçû bi nimêjê berzûrî Xwedê dibû û digot: (Xwedayo! Piştgirîya min bike da ku bawerîyê bi te bînim). Ez bi xwe jî dikarim vê yekê bibêjim. Bawerîya min ne ji bo tu kesî ye. Ez bi xwe dilê xwe nabijînim cîhana din. Bi vê cîhanê kêfxweş im, bi vê afirandinê kêfxweş im, heger cîhaneke din jî bixwazim dê ji bo; tê de, dîtina vê cîhanê be lê bi awayekî çêtir, ez dixwazim ku ji nû ve Xwedê wê biafirîne. Ez ji dayikbûneke nû hêvî dikim, hêvîyên xwe bê nixr pêşkêş dikim.

Em ji dayik dibin, em bi hêz û bi bedewî ber bi ciwanîyê ve diçin, û hêdî hêdî ber bi jêrveçûyîn dest pê dike. Ji nişkê ve; hin pûç dibin, hin kor dibin, hin dikulin, hin kirêt dibin û hergav westaneke hêzdar me dagîr dike. Kê rê daye van tiştan, û ji bo çi wisa bi serê me tê? Wisa min dipirsî, min ji Keşeyan dipirsî û min bi nivîskî ji Papa bi xwe jî pirsîye. Bersiva wan hergav wisa bû (em bersivê nizanin). Lê bersiva Papa bi vî awayî bû: (Papa nikare bersivê bide). Di vî warî de ez dijwarî û dilreqîya Xwedê dibînim, ez bi xwe wek mirov nikarim vî tiştî bipejirînim. Arman Salakro, wek ku ez dixwazim û hez dikim û wek ku em tev dixwazin, hebûn şîrove kiriye: Gerek ku li jîyanê em bi pîremêrî ji dayik bûbûna û di xortanîyê re ber bi zaroktîyê de sernişiv bûbûna. Anku dema ku em bibin zarok piştî ku em di ezmûneya xortanîyê re bihurîbin, ji nû ve em bimirin. Mîna ku mirovek ji dayik bibe û bi nexweşîya penceşêrê be û her ku di temenê xwe de bi awayekî berevajî bi pêş ve çû (ji mezinahîyê ber bi zaroktîyê ve) her ku dê ji nexweşîyê rizgar bibe, ji ber ku di vê bareyê de temen ber bi paş de digindire, ber bi dema xweşiktir û hêzdartir. Ax dê jîyan çendîn xweşik be eger bi vî awayî biherike.

Pirs: Tu wisa jê hez dikî?

Bersiv: Erê, wisa, wisa!

Pirs: na xwe serîhildana li dijî merca pêşîn a çêkirina hebûnê ye, û piştî li dijî ramana mirinê ye jî?

Bersiv: Erê. Ji bo çi gerek e ku em pîr bibin û gerek em bimirin? Ji bo çi pêwist e ku em biêşin û binalin? Ji bo çi gerek e ku em bendemanê bikin? Ji bo çi zor û sitemkarî li vê cîhanê peyda dibin? Ji bo çi ewqas ceng; ji destpêka afirandina vê jîyanê bi milyonan ceng? Dema ku tu li dîmena Deryaya Şîn temaşe dikî tu ji bîr dikî ku li jêr kûrahîya du mitroyan masî li dijberî hevdû di cenga ebedî de dijîn. Ez bi xwe tê nagihêjim ji boyî çi ev gerdûn bi vî awayî hatiye çêkirin û lihevsiwarkirin. Ev pirs bi xwe gumanê li ser hebûna Xwedê li ba min dirust dike. Eger ê ku ev gerdûn afirandibe ne Xwedê be, û eger pêwist be ku dahênerêkî vî gerdûnê hebe, ma gelo ev dahêner kî ye? Wek bersiv dikarim bibêjim ku ev gerdûn ji alîyê firişte û perîyên zîyankar hatiye afirandin.

PIRS: Ez bawer im ku ev pirs bi xwe jî ji alîyê hemwelatîyê te Sioran jî hatiye pêşkêşkirin....

Pirs: Ma te ji xwe pirsîye çima zîyan (şer) her gav bi hêztir e û xêr jî lawaz e lê hetanî a nuha neşîyaye cîhanê rapêçe? (Gîrgard dibêje ku xêr lawaz e ji ber ku ezêlî ye)

Bersiv: Ez bi xwe nikarim vê yekê şîrovebikim, lê dîsa jî pencereyeke hêvîyê ye.

Pirs: De ka em pirsê bi awayekî din bibêjin, kî vê terazûnê diparêze?

Bersiv: Kî dizane? Lê tiştê ku xuya ye hemî ol li ser xêrê radiwestin, di gel vê jî gerek e ku ev pirs ji Xwedê bê kirin. Ji boyî çi ev para hêzdar xistiye destê Şeytên de? Keça min dibêje ku ev pirs mamik e. Madam ev pirs mamik e û nikarim bersiva wê bibînim û ez dê tu carî nikaribim wê çareser û destnîşan bikim, madem wisa ye; dê her û her ev dudilî jî hevrêtiya min bike!

Pirs: De ka em herin mijara ku hevalê Sioran carekê ew li ber min vejandiye. Digot ku mirovê di civateke rewşenbîrî ya hejar de ji dayik bibe; ew mirov her gav payedarîya wî birîndarbûyî ye, ma tu jî li gel wî yî?

Bersiv: Erê.

Pirs: Bi çi tiştî payedarîya te hatiye birîndarkirin? Ma ji destpêkê ve te didît ku Romanya nikare navdarîya navnetewî ya ku te li Fransayê bi dest xistiye, ji te re pêk bîne?

Bersiv: Bi rastî wê çaxê li navdarîyê digerîyam, îro ew navdarî ji min re ne girîng e, reng e ku ji ber ku min bi des txistiye.

Pirs: Carinan tu tinazîyên xwe bi vê navdarîyê nakî?

Bersiv: Gelek caran; hetanî radeya ku min dixwest li kilîseyeke dûr bibim rahibekî bêdeng û tenê nimêjê bi kar bînim. Lê di pirtûka xwe de (Qurbana pêdivîyê) min ev daxwazî pêk anî û min xwe jê rizgar kir. A nuha li teniştê min, hebûna jin û keçê, vî barî sivik dikan.

Pirs: Ma cihêbûna di navbera Romanya û Fransayê de ewqasî mezin e?

Bersiv: Bê guman cihêbûn mezin e. Ji ber ku tu kes nizane Boxarêst û Sofîya li ku dikevin. Lê îro Romanya bi xêra nivîskarên xwe yên ku li derve dijîn, tê nasîn. Lê çi hatiye guhertin, ma ku li derveyî dîrokê bijîya, ne çêtir bû?

Pirs: Lê tu bi xwe ne li derveyî dîrokê yî?

Bersiv: Ma ji bilî navdarîyê min çi sûde ji dîrokê qezenc kiriye? A rast ew e ku ez bi hemî êşên ku min bi kotekî derbasî hundirê dîrokê dikirin, ketime.

Pirs: Ma mebesta te ew e ku te dixwest ku tu jî li derveyî dîrokê bimînî?

Bersiv: Min dixwest ku ez hinekî dûrî wê bimînim û nimêj bikim... Kiryara herî taybetmend a ku mirovatî hewcedarî wê ye nimêj e... Ku ne di nimêjê de be tu wate ji rawestana li derveyî dîrokê re nîne.

Pirs: Ma nimêj çi çareserîyê bi xwe re tîne?

Bersiv: Tenê Xwedê dikare hêjayî vê bersivê be.

Pirs: Ma bawerîya te bi sîdwergirtina ji nimêjê tê?

Bersiv: Ez dixwazim bawerîyê pê bînim.

Pirs: Ma carinan tu nimêj dikî?

Bersiv: Carcaran.

Pirs: Piştî koçbarîya ber bi Rojava ve, te tenhatî hest nekir?

Bersiv: Na.

Pirs: Tu carî te hest nekiriye ku tu di tenhatîyê de dijî?


Bersiv: Yekcar. Min bi xwe zaroktîya xwe li Fransayê derbas kiribû. Bîranînên wê zaroktîyê pir şêrîn bûn. Dema ku ez vegeyîyam Fransayê, vegeyîyam welatê zaroktîyê, ji bilî ku Fransî bi xwe jî û bi awayekî ji awayan bûne Romanî.

Pirs: Ma tu naxwazî li tevlî Romanîyan bibî?

Bersiv: Çawa, bi taybetî wexta ku ez nema Romanî bim, ji nû ve wek birayekî li wan dizivirim.

Pirs: Ez bawer dikim ku ev guhertin piştî hestkirina trajîdîya ku gelê welatê te yê berê tê de dijîya, pêk hatiye?

Bersiv: Rast e.



Pirs: Lê kînga ev hest li cem te bi gewde bûye?

Bersiv: Berî bîst û pênc salan, dema ku min dest bi dijîtîya Fransayê û rojava bi giştî kir, ji ber ku nedixwestin ku rûdan û bûyerên li Romanyayê diqewimin, tê bigihêjin.

Pirs: Ma wê demê, sedîsed, çi qewimîbû?

Bersiv: Ez li kongreyeke ku li ser Romanyayê bû, amade bûm. Hemî amadekaran ji min re digot: (Tu ne rast dibêji). Na herê, yekî ji wan, ji wilo bêtir û diwartir peyivî: (Mafê te û peyivînê nîne ji ber ku tu ji wir hatiyî).

Pirs: Ev lojîk pir seyr e!

Bersiv: Dêmek her kesê ku ji Romanyayê derkeve nikare bibe çavkanîya agahdarîyên rast û durist, hinan ji wan amadekaran Kravşinkoyî bi nokerîyê gunehbar kirin, Sartre jî piştgirîya wan dikir.

Pirs: Ma te Sartre nas dikî?

Bersiv: Ev şerefa mezin bi dest min neket. A rastirîn ew e ku min nexwest ku wî bibînim.

Pirs: Ji destpêkê ve?

Bersiv: Erê, ji destpêkê ve, ji salên şêstî ve, ji dema ku ew nêrîna seyr a li gel Komonîstan wergirtibû...

Palto



Nîkolay Vasîlyevîç Gogol *
Werger Narîna Hajo

Li bîroyeke li Petrogragê, nivîskarek hebû, mirovekî hûrik bû û rengê pora wî bi ser sor ve bû û xuya bû ku dîtina çavên wî gelekî kêr e. Ew nivîskarekî ji pêpelûka nehan bû, ew wek wan kesên ku di çîrokan de bi wan tê kenîn bû. Navê

wî Akakî Akêkîvîç bû. Tu kesî nizanîbû, ka kê alîkarîya wî kiribû da ku bikaribe bikeve ser vî karî û yan jî kengî wî li vê bîroyê dest bi kar kiribû. Serkarê wî û nivîskarên din diçûn û dihatin, lê ew her dem li cihê xwe dima û nedilepitî û tenê yek kar dikir. Ev kar jî kopîkirin bû. Xelkê êdî bawer kiribû ku ew bi vî rengî û bi wî paltoyê xwe yê kevn ve hatiye ser rûyê dinyayê. Roj derbas dibûn bêyî ku kesek guh bidê, ta bi deregevanê li ber derî jî guh nedidayê. Deregevan tu caran ji ber ranedibû û carinan silava wî jî venedida. Serkarên wî tu caran rû nedidayê û bi quretî pê re dipeyivîn. Serekê nivîskaran ji bo nivîsandinê pelik didanê, lê bêyî ku ew li rûyê wî binêre, wî kar diavêt ser masê, bêyî ku kes bizaibe dide kê, lê Akakî bê deng radibû û dest bi kar dikir .

Nivîskarên xort, ên li bîroyê kar dikir, kenê xwe bi Akakî dikir. Çîrok li ser çêdikirin û li pêşîya wî di rûyê wî de ji hev re digotin:

- Xwedîya xaniyê wî ya heftê salî lê dixê û jê re dibêje: Ma em ê kengî hevdû bikin. Pelik di ser serê wî re hûr dikirin, wek ku berf were bibare. Lê wî tu caran dey nedîir, û dema ku karê wî diqeda, tu kesî kêmbûn li cihê rûniştina wî nedidît. Carinan, dema ku hevkarên wî ew gelekî têşand û nedihîşt ku ew karê xwe bike, wî ji wan re digot:

- Dev ji min berdin, ma hûn çî ji min dixwazin!? Hûn çima wilo li min dikin? Dengê û gotinên wî dihişt ku dilê wan pê bişewite. Carekê xortekî nû hatibû li bîroyê kar dikir, xwest ku wek her kesî pê bikene, lê ji nişkê ve rawestîya wek ku ji xewnekê şiyar bibe. Piştî hingî ew tu caran pê nedikenî û her dem ji xwe re digot:

- Çima mirov birayê xwe yê mirov hevqasî têşîne!

Gelekî zor e ku tu kesekî wek Akakî bibînî, ku bi tenê ji bo karê xwe bijî û jê hez bike. Karê wî çîhana wî bû, wî çîhaneke gelekî xweş di kopîkirinê de didît. Wî kêf, xweşî û şahî di nav tîpên alfabêtê de didît. Rojekê serkarekî dilpak xwest ku Akakî bibe cihê baştir û karekî çêtir bidê, lê ev tişt gelekî li Akakî nexweş hat û wî got:

- Ez dixwazim ku vegerim karê xwe yê berê, kopîkirin ji bo min gelekî baş e. Piştî wê yekê êdî tu kesî nema lê pirsî û ew wan bi tenê ji kopîkirinê re hişt. Akakî tu caran guh nedida cilan, paltoyê wî dirêj, kevn û gemar bû. Dema ku ew bi rê de diçû jî guh nedida tu tiştî û hay ji tu tiştî nedima. Ku toz û gemar ji penceran bi ser serê wî de bihata xwar an jî ku hespekî serê xwe yê westayî danîbûya ser

milê wî, dîsa jî wî guh nedidayê û ew ê bi rêya xwe de biçûya. Talîyê, dema ku ew digeha mala xwe, radibû bi lez cilên xwe diguhertin û xwarina xwe dixwar. Akakî tu caran guh nedida xwarinê jî, rengê wê çilo be, xweş be ya ne xweş be, wî lê nedişkand. Carinan mêş û gemar pê re dixwarin bêyî ku pê zanibe. Paşê jî ew diçû, pelikên ku bi xwe re ji bîroyê anîbûn didanîne ber xwe û ew kopî dikirin. Heke tu kar nebûna jî, wî ji xwe re ji ku bûya jî karek derdixist, lê Divîyabû ku ew roja xwe bi kopîkirinê bibihurênê. Wî nizanîbû tu mijûlayîyên din ji kopîkirinê pê ve bike. Kesekî ew tu caran li şahîyekê nedidît. Lê dawîyê ew diçû nav livîna xwe û bi dilxweşî li hêvîya sibe dima, ka bê wê Xwedê ji bo kopîkirinê çi jê re bişîne.

Ev bû jîyana Akakî. Ew kesê ku sala karê wî dikir çar sed rûbil, lê dîsa jî ew pê qayil bû. Dibe ku têra xwe jîyaba, lê zor û zehmetîyên jîyanê li pêşîya wî bûn. Li Petrogradê dijminekî dijwar ê her kesê ku sala karê wî ji çar sed rûbilî nebêhtir bû hebû. Ew dijmin ne tu kes bû ji serma Bakur pê ve.

Her sibeh ji seet heşt ta seet neh rê û rêbar ji karker û xwedîkaran tîr dagirtin. Serma di wê çaxê de, dihişt ku bêhvila nivîskarên belangaz bişewite ku nizanibin ew bêhvîlên xwe di ku xin. Ew bi tenê dikarin xwe di nav paltoyên xwe de bipêçin û bi lez bazdin bîroyên xwe. Akakî pê dihesîya ku sermakyêke dijwar dide navmilên wî û li piştê wî dixê, lê wî ji xwe dipirsî:

- Ka ev tişt ji ber çi ye?

Carekê paltoyê xwe danî ber xwe û baş lê nêrî, wî dît ku çend qul lê vebûne dihêlin ku ba bi serbestî di wan re bibihure. Êdî zanîbû ku çima piştê wî di wan sibehan de dişewite. Paşê wî biryar da ku paltoyê xwe bibe ba Pêtrovîç, ew dirûnkerê ze'îf ê bi çavekî, ê ku hê karîbû cilên belengzan bidrû û pîne bike.

Akakî çû mala Pêtrovîç. Bi rê de ji xwe re digot:

- Gelo ew ê dora çiqasî ji min bistîne! Xwedê bike ku ew serxweş be da ku gelek peran ji min nestîne!

Hêvîya Akakî ne di cihê xwe de bû. Pêtrovîç ne serxweş bû, lê ew gelekî ji xwe ne razî bû ji ber ku wî nikarîbû ta bi derzîyê ve bike.

Akakî silav lê kir:

- Roj baş!

- Roj baş! Pêtrovîç silava wî vegerand û bi çavê xwe yê tek li tiştê di destê Akakî de nihêrî. Akakî nema zanîbû çî bibêje, lê got:

- Pêtrovîç, ez hatime... binêre... ev.

Pêtrovîç zanîbû ku wî çî divê. Wî rahişt palto vekir û lê nêrî. Pêtrovîç serê xwe hejand û got:

- Ev nema çêdibe; nema hêja ye ku ez pêre biwestim.

Dilê Akakî êşîya, rabû jê re got:

- Çima, Pêtrovîç! Binêre, bi tenê navmil wî qul bûye.

Lê Pêtrovîç rê nedayê û gotê ku ew nikare palto çêbike, û divê ew yekî xwe yê nû bidrû. Dema ku Akakî ev tişt bihîst dinya li dora serê wî zivirî. Lê ji Pêtrovîç pirsî: Ka wê paltokî nû bi çiqasî çêbibe!

Pêtrovîç got:

- Bi sed û pêncî rûbulan wê paltokî gelekî baş çêbibe.

Akakî derket derve, lê wek ku di xew de be, ew diçû û diçû lê nizanîbû bi ku de diçe! Bi xwe re di peyivî û di got:

- Ez ê sed û pêncîyî ji ku bînim! Lê çima... Tu caran palto ne hêjayî sed û pêncî rûblan e. Wî wilo ji xwe re got û got. Dawîyê gihaşt biryara ku paltoyekî xwe yê nû bidirû. Lê ma wê peran ji ku bîne! Ev li ser bextê wî dimêne. Ku serekê bîroyê çil rûblî bidê wê gelekî baş bê, ji ber ku çil rûbilên wî jî hene. Akakî dixwest ku gelek tiştan bi van peran bike, lê ji bo palto divê ku hemû planên xwe ji bîr bike. Piştî ev qas salên kar, Akakî çil rûbil bi tenê dabûn hev. Virde, wêde... dawî nîyeta xwe lê anî ku palto bikire. Lê ji vê rojê pê ve divê tu peran xerc neke. Divê xwarina xwe kêmbike. Çaya êvaran venexwe û mûmê bi şev pênexe, û wî wilo jî kir. Rojekê ew çû cem Pêtrovîç, piştî bazareke dûr û dirêj li ser heştê rûbilî li hev hatin lê Divîyabû ku Akakî pêşî peran bîne, da ku ew dest bi dirûtinê bike. Akakî ji wê rojê ve dihat malê, li şûna ku şivê bixwe, xwe dirêj dikir û wî dianî ber çavên xwe ku çawa ew paltoyê xwe têne û li xwe dikr. Li hêvîya paltoyê xwe bû wek ku li hêvîya hevalekî xwe yê delal be.

Roj li pey rojê diçû û hê pere peyda nekiribûn. Lê rojekê serkar ji ber ku karê wî her dem qenc bû, şêst rûbil danê. Akakî bi kêfxweşîyeke mezin vegeşîya malê. Piştî rasterast çû ba Pêtrovîç û pere danê.

Sibehekê Pêtrovîç palto anî mala wî. Akakî hew dizanîbû êdî çî bike! Ew roj ji hemû rojên jîyana wî geştir û xweştir bû.

Akakî palto li xwe kir û bi serbilindî çû bîroya xwe. Her kesî dizanîbû ku Akakî paltoyekî nû li xwe kiriye. Pîrozî danê û jê re gotin ku divê ku devê wan şêrîn bike. Akakî nema zanîbû çî bike û çî bibêje, lê serekê nivîskaran ji wan re got:

- Baş e, hûn hemû îşev li ba min in. Em ê ji bo paltoyê Akakî şahîyekê li dar bixin. Akakî bi dilşahî vegeşîyaa malê, palto ji xwe kir, ê kevn anî ber û ji xwe re kenî. Li paltoyê xwe dinêrî. Ew roj roja pêşî bû ku tu tişt kopî nekiribû. Êvarê, Akakî rabû, paltoyê xwe li xwe kir û derket, da ku here mala serekê nivîskaran. Bi rê de Akakî li dora xwe dinêrî û piştî xwe rast kir û bi rêya xwe de çû. Dawîyê gihaşt xanîyê serkar, ku li tarikeke xweş bû. Xanîyekî xweş û mezin bû. Qelebalix ji oda rûniştinê dihat. Derî jê re hat vekirin. Paltoyê xwe jê kir û danî. Nema zanîbû çî bike, lê wan zû ew dît û hatin pêşîya wî, lê belê wan ew zû jî ji bîr kir û çûn bi pelikan leyistin. Akakî nêzîkî wan rûnişt û li wan dinêrî. Piştî kêlîkekê ew westîya û xwest ku biçe mala xwe. Wan nehişt û şampanya jê re anîn. Piştî vexwarinê Akakî dilxweş bû, lê dîsa bê deng ji cem wan derket, da ku here malê. Akakî dilxweşî diçû. Li jinên xweşik dinêrî û ji xwe re dikenî, ta ku gihaşt tarika xwe ya belengaz. Rê vala bûn, kesek li wan deran xuya nedikir. Çend çiran rehnîk dida wê ferehîya di nav xanîyan de. Berf li ser rê bû û dinya gelekî sar bû. Ji nişka ve kêf û şahîya wî çû. Li dora xwe nêrî ji berfê û xanîyê tarî pê ve tu tişt nedît. Çavên xwe girtin, da ku wan hew bibîne, lê dîsa jî xwest ku çavên xwe veke, da ku binêre ka hê xanîyê wî çî qasî dûr e. Dema ku çavên xwe vekirin, du kesên bi simbêl û dirêj li pêşîya xwe dîtin. Wî baş nedidît, lê hema pê hisîya ku kulmek li sînga wî ket. Kir ku bike hewar, lê kulmeke din li devê wî ket. Kulma sisêyan li ûrê wî da. Ew li ser piştî xwe li ser berfê dirêj bû û bê hiş ket. Kêlîkek tê ve çû, hat ser hişê xwe, li dora xwe nêrî ji berfê pê ve nedidît. Li xwe nêrî dît ku paltoyê wî hatiye dizîn. Baz da, gazî nobedaran. Kesekî lê venegerand. Çû ba polîsan lê bîroya wan girtîbû. Çû mal, lê nikarîbû raze.

Roja din ew neçû karê xwe. Ew cara pêşî bû ku neçûbû kar. Dîsa ew çû ba polîsan, lê wan guh nedayê. Akakî pê hisîya ku tu alîkarîyê nadinê. Roja din çû ser karê xwe. Hemû gelekî xeyidîn û her yekî şîretek lê kir. Lê yekî gotê: - A ji her tiştî baştir ew e ku tu çîroka xwe ji mirovekî biqîmet û xwedî nav û deng re bibêjî. Akakî jî bi şîreta wan kir û çû cem mirovekî wilo. Ew nû zengîn bûbû û ew gelekî ketîbû darî çavên xwe. Ji wilo jî, dmea ku Akakîyê belengaz ket bîroya wî, bi dengêkî tûj û bilind pê re peyivî. Hişt ku ew di cihê xwe de bimîne û bilerize. Akakî nema zanîbû ku êdî çî bike yan jî çî bibêje! Lê wî nas kir ku ew êdî tiştêkî jê re nake. Bi kul û keser ji cem derket; nema hay ji dora xwe ma. Di bin baranê de di sikakan ve diçû. Wê şevê xew neket çavên Akakî.

Tayeke giran ew girt û piştî du rojan ew mir. Xwedîya xênî ew bir veşart.

Li Petrogragê jîyan digeriya wek ku tiştê nebûbe û wek ku Akakî tu caran nebû. Mirovek mir, yekî ku kesekî tu caran guh nedabûyê. Tu xweşî û şahî nedîtibû. Paltoyê nû di jîyana wî de her tişt bû. Palto şahî xist jîyana wî, lê ew şahî gelekî kurt bû. Bayekî zer hat û her tişt bi xwe re bir. Nivîskarekî din hatibû bîroyê cihê Akakî girt. Ew ji Akakî dirêjtir bû, lê belê karê wî ne wek ê berê rind bû. Rast e ku Akakî mir, lê ev ne dawîya çîrokê ye, ji ber ku hê jî têbayê wî piştî mirina wî bi çend rojan dijîya. Diviyabû ku Akakî bê deng ji vê dinyayê neçe. Çîrokin li nav Petrogragê digeriyan, wan digot ku têbayek bi şev li ser pira Kalînkî digere. Ew têba wek nivîskarekî hûrik e û li paltoyekî digere. Paltoyên xelkê ji wan dike, êdî ji tîrsa nema kes diwêre dîza bigire, ku ew têba bin. Carekê karkerekî bi her du çavên xwe dît û nas kir ku ew Akakî bû, lê jê tîrsa baz da. Têbayê wî li Petrogragê digeriya û tîrs dikir nav dilê xelkê. Piştî wê ew mirovê bi nav û deng ku Akakî qewirandibû pir poşman bûbû û rûyê rebenê Akakî ji ber çavan nedîçû. Wî şîyand pey Akakî, lê Akakî hingî miribû. Dema ku wî bihîst ku ew reben miriye, wek, ku bayekî zor lê bide û bêhna wî biçikîne lê hat. Da ku ew vê çîrokê ji bîr bike, ew rabû çû şevbuhêrkekê ku li wê derê dilê xwe xweş bike, gelek kes li wir hebûn hemû zengîn û navdar bûn, şampanya vexwar û şev bi xweşî derbas kir. Dawiyê li paytona xwe siwar bû, got paytonçî, da ku wî bibe mala hevalê wî. Ew şeva xweş dianî bîra xwe, lê ji nişkê ve mirovekî ew ji pişt ve girt. Lê nêrî, dît ku mirovekî hûrikî bi paltokî dirêj e. Ew Akakî bi xwe bû. Rûyê wî wek cawekî sipî bû û dêhna têba pê diket. Têba jê re got ku tu ketî nav destê min! Te alîkariya min nekir, da ku ez paltoyê xwe bibînim. Te dengê xwe li min bilind kir, ez jî ez ê paltoyê te bibim. Wî kir ku ji tîrsan bimire û ji hingî û pê de wî hew deng li kesekî bilind kir û wek berê negot:

- Tu dizanî tu bi kê re dipeyivî, tu dizanî ez kî me?

Hê jî xelkê bawer dikir ku têba li tarikên Petrogragê bi şev digere. Lê vê carê ew têba ne hûrik bû, ew dirêj bû û simbêlên wî hebûn. Wî baz dida û di reşa şevê de wînda dibû.

· *Nîkolay Vasîlyevîç Gogol*

Gogol Nîkolay Vasîlyevîç (1809-1852) nivîskarekî Rûsî yê bi nav û deng e. Gogol gelek çîrok nivîsandine. Ji wan jî: *Çîrokên Petrogradî, Vladîmîrê Pêpelûka Sisêyan, Revîzor, Canên Mirî, Palto* û yên din. Çîrokên wî ji rengê kenê di nav hêstiran de



Masîyê Reş ê Piçûk

SAMED BEHRENGÎ

Wêne: Mats Abelson

werger: Xalidê Ezîz

ne. Di temenê çil salî de -wek ku di çîroka *Cihên Bijartî* û di nameyên wî yên ji dost û hevalên wî re dîyar dibe de- bîr û bawerîyên kevneperest lê hatine xuyakirin. Komeke nivîskarên Rûs ên bi nav û deng, ên rexnevanên reyalîst li pey şopa Gogol çû. Ew li Rûsyayê bi navê Dibistana Xweristî hatibûn binavkirin.

Şeveke sar ji şevên zivistanê bû. Di binê deryayê de masîyeke pîr, nêzî diwazdehezar zarok û nevîyên xwe li dor xwe civandibûn û ji wan re çîrokek digot:

"Hebû tunebû. Masîyekî reş ê piçûk hebû. Ev reşemasî bi dêya xwe re, di çiqilçemekî de dijîyan, çiqilçem ji binê çîya derdiket û di nav gelîyekî pir mezin re diherikî.

Mala Masîyê reş û dêya wî, di binê keviyekî reş de bû. Ser wê bi gîyayê binê avê hatibû girtin. Şev, di binê gîyê de radizan. Dilê

Masîyê reş ê piçûk dixwest ku hema carekê ronahîya heyvê xwe berde nav mala wan a tarî.

Ji serê sibê heta êvarî, dê û masîyê reş, carinan bi tenê, carinan jî bi masîyên din re, di nav wê ava hindik de avjenî dikir. Masîyê reş ê piçûk, tekê dêya xwe bû, bi tenê bû. Ji ber ku ji deh hezar birayan ew bi tenê ji dêya xwe re mabû. Piştî çend rojan Masîyê reş bê hiş bûbû, bi kesekî re nedipeyivî. Ji xwe re digerîya û dihizirî. Nedigihast dêya xwe, li pey dima. Masîya dê fam kiribû ku tiştek heye. Digot, dibe ku nexweş be, ê êzîk baş bibe, lê derdê Masîyê reş tiştekî din bû.

Rojekê hê ro nehilabû, Masîyê reş dêya xwe ji xewê şiyar kir:

Dayê! Ez dixwazim bi te re bipeyivim.

Masîya dê, hîn bêhişa xewê bû. Weha got:

- Lawo, ma pêwîst e ku nuha tu bi min re bipeyivî? Dema me pir e, were em hinekî ji xwe re bigerin.

- Na dayê, ez êdî naxwazim bigerim. Divê ez ji van deveran herim.

Masîya dê:

- Tu dixwazî ji vê derê herî!?

Masîyê reş:

- Erê dayê, divê ez herim.

Masîya dê:

-Di vê tarîya şevê de, tê bi ku derê ve herî?

Masîyê reş:

- Ez dixwazim dawîya vî çiqilçemî bibînim. Ji mêj ve ye li ser dihizirim. Dawîya vî çiqilçemî diçe ku derê? Min çî bersiv jî ji wê re nedît. Ji doh şev ve xew neketiye çavên min. Her difikirim. Di dawîyê de min biryar da, ku gerek ez herim bibînim. Ez dixwazim ku bizanibim û bibînim ka li cihên din çî heye, çî nîne?

Masîya dê bi dilekî şewitî, kenîya û got:

Ez jî di zaroktîya xwe de wekî te difikirîm. Lawo, ser û binê vî çiqilçemî tune ye. Çî hebe li vê derê ye. Ev aveke wisa ye ku her dem diherike, diçe û nagihêje tu cihî.

Masîyê reş:

- Dayê, dawîya her tiştî heye, roj diqede, şev diqede, hefte, meh, sal...

Masîya dê gotina wî birî û jê re got:

-Kurê min, hewqas serhişk nebe. Rabe ka em hinekî ji xwe re bigerin. Nuha dema gerê ye, ne ya peyivînê ye.

Masîyê reş;

- Na dayê, ez êdî ji çûn û hatinê westîyam, Ez dixwazim ku herim cihên din, hinek tiştên din bibînim. Dawîya vî çiqilçemî bibînim. Bawer neke ku hinekan ez xapandime, ji mêj ve, ez li ser vî tiştî dihizirim. Lê ez ji masîyên din jî fêrî gelek titşan bûme. Wek; gelek masîyên pîr ji jîyana xwe ya vê derê ne dilxweş in. Ew her dem heyfa xwe li ciwanîya xwe tînin û digirîn. Ez dixwazim ku bizanibim, ka bi rastî jîyan bi tenê di vî çiqilçemî de çûn û hatin û pîrbûneke tewş e, an bûnewer dikare li vê cîhanê bi awayekî din jî bijî,

Masîyê reş demekê rawestîya.

Dêya wî:

- Kurê min, delalê ber dilê min, ma qey tu nexweş î hetanî ku tu wisa dipeyivî? Cîhan...Cîhan... Cihê ku em lê dijîn cîhan e û jîyan jî ev e ya ku li cem me heye.

Masîyên din jî bi dengê wan hisîyan û hatin cem wan. Dema bihîstin, ku Masîyê reş ê piçûk çî dibêje, tev bi ser de rabûn û got, çî tişteki ne xweş e ku ev masîyê piçûk tê vê derê û dixwaze masîyên mezin hînî wê yekê bike ka jîyan li ku derê ye.

Masîyê reş gotin dirêj nekir û xwe ber bi dawîya çiqilçem ve berda, da ser rêya xwe ya dirêj.

Masîyê reş rastî beqan hat, wan digot qey cîhan tenê ew sukra ku tê de dijîn û tu kes jî ji wan xweşiktir nîne. Piştî rastî kêvjalekî hat, Kêvjal xwest ku wî bixwe, lê ew ji ber revîya. Tiştên ku bi serê Masîyê reş dihatin, roj bi roj, cîhan çêtir pê dida naskirin. Piştî hefteyekê rastî marmarokekê hat:

Masîyê reş:

Marmarokê, ez masîyekî reş ê piçûk im, ez dixwazim ku herim hetanî dawîya vî çiqilçemî. Ez bawer dikim, ku tu lawireke jîr î, lewre dixwazim ku tiştêkî ji te bipirsim.

Marmarok:

- Fermo, tu çi dixwazî dikarî ji min bipirsî.

Masîyê reş:

Li ser rêya min gelean ji min re got, ku haya te ji pelîkan, ji şûrmasî û ji reşreşikan hebe. Heger tu tiştêkî li ser wan zanibî, ji min re bibêjî.

Marmarok:

-Li van deran şûrmasî û reşreşik nînin. Bi taybetî şûrmasî, ew di nav ava deryayê de dijîn. Li van deveran pelîkan hene. Ha ji xwe hebe, ku tu nekevî nav tûrên wan yê xwarinê.

Masîyê reş mit û mat ma û pirsî:

- Tûr çi?

Marmarok:

-Tûrek di bin nikulê pelîkan de heye ku dikare gelek avê têxe devê xwe. Ew devê xwe di nav avê de vekirî dihêle û hinek masî bi nezanî dikevin devê wî û rasterast diçin nava zikê wî, heger ku pelîkan ne birçî be, wan masîyan ji bo ku piştê bixwe di nav tûrê xwe de girtî dihêle.

Masîyê reş:

- Masîyê ku bikeve nav tûr, ma qet rêya rizgarbûnê jê re nîne?

Marmarok:

-Ji bilî çirandina tûrik tu rêyeke rizgarbûnê nîne. Ez dê xencerekê bidim te. Heger ku tu bikevî nav tûrikê pelîkanê, tu yê bikaribî tûrik biçirinî, xwe ji wê derê rizgar bikî.

Marmarok di nav qelşeke kevir de hunda bû. Dema paşve hat, xencerek di destê wê de bû,

Masîyê reş xencer jê stend û got:

- Tu çiqas baş î. Ez nizanim ka ez dê çawan sipasîya te bikim!

Marmarok:

- Ne pêwîst e ku tu sipasîya min bikî, gelek ji van xenceran li cem min hene, di demên xwe yên vala de, rûdinê û ji sitiriyên gulan xenceran çêdikim û dîyarî masîyên jîr ên wek te dikim.

Masîyê reş ê piçûk:

- Ma berî min jî masî di vê derê re derbas bûne?

Marmarok:

- Gelek, gelek masî derbas bûne. Nuha êdî komeke masîyan ji xwe re çêkiriye, ev kom, masîvanan dixwe rewşeke pir dijwar.

Masîyê reş:

- Bibuhure marmarokê, min pir tişt ji te pirsîn, lê gotin gotinê dikişîne. Ez dixwazim ku pirseke din ji te bipirsim, gelo masîyan çi bi serê masîvanan anîye?

Marmarok:

Wan fam kiriye, ku yekîtî hêzê çêdike, îca dema ku masîvan tora xwe diavêjin binê avê, ew bi hev re dikevin tora masîvanan û wê dikişînin binê avê û didirînin.

Marmarokê guhê xwe da qelşoka kevir, guhdarî kir, piştî weha got:

- Masîyê min ê reş ê piçûk, bibuhure, divê ku nuha ez herim, zarokên min şiyar bûn. Piştî çû di nav qelşoka kevir de hunda bû,

Masîyê reş dixwest ku hinekî din jî li wir bimîne, lê piştî ku marmarok çû, dîsa da ser rêya xwe. Pir tişt di serê wî de tevlihev bûn, gelo dê ev çiqilçem bigihêje deryayê da ku pelîkan min bixwe! Çima reşreşik jî dijminatîya me dikin! Gelo dê ji dilê şûrmasî were ku masîyekî din bixwe?

Masîyê reş bi rê de dihizirî û diçû. Di her demekê de tiştêk didît û hînî tiştêkî din dibû. Wî dît ku xezalek li qeraxa çiqilçemî avê vedixwe, silav lê kir û nêzî wê bû.

Masîyê reş:

- Xezala xweşik, bo çi tu wisan dilezînî?

Xezal:

-Nêçîrvan li pey min em û ez bi guleyekê birîndar kirime, ha ji vir.

Masîyê reş şûna guleyê nedît, lê dema xezal dûr ket û çû, ji kulandina wê fam kir ku wê rast gotibû, li qeraxê din, reşan xwe li ber tavê dirêj kiribû, qebe-qeba kewan gelî dihejand, bêhna gul û çîçekên çiyê li hewayê belav dibû û tev li avê dibû.

Piştî nivro ew hat cîhekî, av êdî firehtir û bi hêztir bûbû, di nav zilan de diherikî. Dilê Masîyê reş şa bû, piştî qasekî din, rastî komeke masîyan hat, ji xwe ji wê dema ku Masîyê reş ji dêya xwe û ji hevalên xwe veqetîyabû, pêrgî masîyekî jî nehatibû, ew masî yên pêşîn bûn ku ew rastî wan dihat, çend masî hatin cem wî û jê pirsî:

- Tu xerîb î, ne wisa?

Masîyê reş ê piçûk;

- Erê, ez xerîb im. Ez ji cîhekî gelekî dûr tîm.

Masîyên piçûk:

-Baş e, ma tu dixwazî herî ku derê?

Masîyê reş ê piçûk;

-Ez diçim da ku dawîya vî çiqilçemî bibînim.

Masîyên piçûk:

- Kîjan çiqilçemî?

Masîyê reş ê piçûk:

- Çiqilçemê ku hûn tê de avjenîyê dikin.

Masîyên piçûk:

-Lê em ji vê re dibêjin çem. Û... ma tu nizanî ku pelîkan li devê rê li benda te ye?

Masîyê reş ê piçûk:

-Belê, dizanim.

Masîyekî din:

Baş e, ma tu dizanî ku tûrekî mezin ê pelîkan heye?

Masîyê reş ê piçûk;

-Erê, ez wê jî dizanim.

Masîyê piçûk;

Û dîsa jî tu dixwazî herî?

Masîyê reş ê piçûk:

- Belê, çî dibe bila bibe, ez dê dîsa jî herim.

Xeber zû di nav masîyan de belav bû, ku masîyekî reş ji cîhekî pir dûr hatiye û dixwaze ku here dawîya çem bibîne û ji pelîkan jî natirse. Hinek masîyên piçûk dixwest ku bi wî re herin, lê ji mezinên xwe newêribûn. Wan dengê xwe dernexist. Çend kesan ji wan weha got:

- Axx, eger pelîkan tunebûna, em jî dê bikarîbûna bi te re bihatina. Lê ew tûrê wî me ditirsîne.

Li kêleka çem gundek hebû. Keç û jinên gund kinc û firaxên xwe di vî çemî de dişûşt. Masîyê reş ê piçûk hinekî li wan guhdarî kir. Li şûştina zarokan mêze kir. Piştî dîsa ket rê. Çû û hey çû. Hetanî ku bû şev her diçû. Dawî di bin kevirekî de ket xewê. Carekê şiyar bû û dît, ku ronahîya heyvê xwe berdaye ser rûyê avê, her der ronî kiriye.

Masîyê reş ê piçûk gelekî ji heyvê hez dikir. Dema ku ronahîya heyvê diket ser rûyê avê, ew ji bin gîyayan derdiket û dixwest ku hinekî bi heyvê re bipeyive. Lê her gav dêya wî şiyar dibû û ew dikişand binê gîyayan û dîsa ew diket xewê.

Masîyê reş li rûyê heyvê nihêrt û got:

- Silav, heyva xweşik.

Heyv:

Silav, Masîyê reş ê piçûk. Tu ji ku derê hatiyî, li çî digerî ?

Masîyê reş ê piçûk:

- Ez derketime da ku li cîhanê bigerim.

Heyv:

- Cîhan pir mezin e. Tu nikarî li her derê bigerî.

Masîyê reş ê piçûk:

- Tişt nabe, hetanî ku ez bikaribim ez dê bigerim.

Heyv:

- Dilê min dixwaze ku hetanî serê sibê bi te re bimînim. Lê ewrekî reş û mezin wa ye bi lez tê û dixwaze ku li ber min bigire.

Masîyê reş ê piçûk:

- Mîrza heyv, xwezka tu bizanibî çendîn ji te hez dikim. Ez qet naxwazim ku tîrêjên ronahîya te ji ser min kêmbibin.

Heyv:

- Masîyê min, rastî bibêjim, ronahîya min jî tune ye. Ez ronahîya xwe ji rojê disitînim û dîsa dişînim, te qet tiştêkî weha bihîstibû? Piştî çend salan dê mirov werin xwe li ser min bi cih bikin û em dê bi hev re bijîn.

Masîyê reş ê piçûk:

- Ma tiştêkî wisa gengaz e?

Heyv;

Bi rastî, a zorbûnê zor e. Lê piştî ku mirov xwest, tiştê ku nikaribe tune ye...

Hîn heyvê gotina xwe neqedandibû, ewrê reş li ber wê girt. Her der dîsa reş bû.

Masîyê reş mat ma û li tarîyê nihêrt. Piştî çû ket binê kevirê û raza.

Serê sibê zû şiyar bû û bihîst ku çend masî bi dengekî nizim bi hevdû re dipeyivin.

Dema ku wan dît ku Masîyê reş şiyar bû, tevan bi hev re got: Roj baş! Masîyê reş ew nas kirin.

Masîyê reş got:

- Roj baş, ma hûn jî gihastin min? Masîyekî piçûk;

- Belê, lê hê jî em ditirsîn.

Masîyekî din:

- Tîrsa ji pelîkên, me rehet nahêle.

Masîyê reş ê piçûk:

- Hûn jî pir dişêwirin. Tenê bi şêwirandinê dema xwe derbas nekin. Ka em bi rê kevin, em ê vê tîrsê ji ser xwe biavêjin.

Dan ser rê, piştî demêkê ava dora wan bilind bû. Bû şereş, nikaribûn tu cîhekî bibînin. Masîyê reş fam kir ku ew ketine tûrê pelîkan. Ji hevalên xwe re weha got:

- Hevalno, em ketin nav dafika pelîkên. Lê dîsa jî rêya rizgarbûnê nehatiye girtin.

Masîyên piçûk dest bi girî kir, yekî ji wan weha got:

- Êdî em nikarin rizgar bibin. Tev ji rûyê te ev tişt hat serê me. Te em xapandin, te serê me kir gêjayîyê.

Yekî din:

- Em êdî mirî ne. Ew dê nuha me tevan bixwe.

Kenekî pir bideng av lerizand. Ev ken, kenê pelîkan bû. Dikenîya û dipeyivî;

- Min gelek masîyên piçûk girtin, ha ha ha. Heyfa min bi we tê ku ez we bixwim, ha ha ha.

Masîyên piçûk dest bi hêvîyan kir:

- Pelîkana pak û dilovan, em mezinatîya te her dem dibihîzin. nikulê xwe yê xweşik veke, da ku em bikaribin derkevin der. Hetanî ku em li darê jîyanê bin em ê ji te re xweşîyê bixwazin.

Pelîkan:

- Nuha ez naxwazim ku we bixwim. Li binê tûr binhêrin. Hûn dê gelek masîyên berhevkirî bibînin...!

Di binê tûr de gelek masîyên piçûk û mezin berhevkirî bûn.

Masîyên piçûk:

- Pelîkana dilovan, ka me çî bi te kiriye? Çî gunehê me heye? Vî Masîyê reş, em tev xapandin.

Masîyê reş bi qîjeqîj got:

- Tirsonekno, çima hûn ji vê çivîka dekbaz hêvîyan dikin. Hûn çawa dikarin hêvî bikin? Ma hûn ji xwe fedî nakin?

Masîyên piçûk:

- Ma te hay ji gotina xwe heye, ma tu dizanî tu çî dibêjî? Tu yê nuha bibînî, dê pelîkan me azad bike û dê tenê te bixwe.

Pelîkan weha got:

- Erê, ez dê we azad bikim, lê mercekî min heye.

Masîyên piçûk:

- Fermo, fermo mercê xwe bibêje, seroka me.

Pelîkan:

- Ku hûn bixwazin rizgar bibin, wî masîyê zimandirêj bifetisînin.

Masîyê reş xwe kişand quncikekê û got:

- Tirsonekno! Ev çivîka dekbaz me bera hevdu dide. Ka bisekinin, tişte hat bîra min...

Lê, masîyên piçûk ketibûn heyrana canên xwe. Qet li tişteki guhdarî nedikir û êrîşî Masîyê reş kir. Ew bi paş ve vedikişîya û bi dengê nizim weha digot:

- Tirsonekno! Çawa be hûn jî hatine girtin, rêya we ya rizgarbûnê jî tune ye, û hûn nikarin bi min.

Masîyên piçûk;

- Divê ku em te bifetisînin, ji bo ku em rizgar bibin, divê em te bifetisînin! Masîyê reş:

-Hûn dîn bûne. Bi wê bawer nekin, lê bizanibin, ku hûn min bikujin jî, hûn nikarin xwe ji vê derê derxînin.

Masîyê piçûk:

-Ji boyî ku xwe rizgar bikî tu wisa dibêjî, ne ku dilê te li ser me ye. Masîyê reş:

- Baş e, wê demê hinekî li min guhdarî bikin, ez dê rêyekê nîşanî we bidim. Ez dê di binê tûr de wek mirîyan xwe di nav masîyên din de dirêj bikim. Ka binihêrin, ew ê pelîkan we berde yan na, heger ku hûn vê pêşniyaza min nepejirînin, ez dê we tevan bi xencera xwe bikujim, tûrikê wê biçirînim û birevim. Hûn ji,..

Masîyekî piçûk gotina wî birî û girîya:

- Êdî Bes e, ez nikarim li ber xwe bidim, Hû, hû, hû...

Dema ku Masîyê reş ê piçûk, masîyê ku digirîya dît; bi qîjeqîj got:

- We çima ev zarokê dêya xwe, bi xwe re anîye!

Piştire xencera xwe kişand û ber bi alîyê masîyan ve hejand. Wan ji tirsan, pêşnîyaza Masîyê reş ê piçûk pejirand, bi henekî, di nav xwe de dest bi pevçûnekê kir. Masîyê reş wek termekî, xwe berda binê tûrik, masîyên din derketin jor:

- Mîrza pelîkan, me Masîyê reş ê zimandirêj fetisand.

Pelîkan kenîya:

- We gelekî baş kir. Ji ber vê yekê, ez ê we bi saxî bixwim, da ku hûn ji xwe re bikaribin di nav zikê min de bigerin.

Berî ku masî fam bikin ka çi bû, hatin daqurtandin, bi lez di nav qirika pelîkan re derbas bûn û jîyana wan qedîya.

Masîyê reş ê piçûk, xencera xwe kişand û tûrê Pelîkan çirand û derket derve. Ji êşa qîjînî bi Pelîkan ket, serê xwe li avê xist, lê nikarîbû Masîyê reş ê piçûk bigire, Masîyê reş ê piçûk hetanî nivro çû.

Nuha êdî çîya û gelî li paş wî dimînin, çem di nav deşteke rast de diherikî. Ji her du alîyên çem, çiqilçem digihaştinê û av zêde dibû, Masîyê reş di nav hewqas avê de gelekî dilxweş bû, carekê bi xwe hesîya, ku binê avê xuya nake. Bi alîyê rast û çepê ve çû, lê li tu cîhekî neket, av pir bû, Masîyê reş xwe wenda kiribû. Li vî alî-wî alî diçû û dihat.

Carekê nihêrt, ku wa ye tişteki mezin, bi şûr, wek tîrekê bi ser wî ve tê, devê wî wek birekê bû. Masîyê reş fam kir ku ew çi ye. Şûrmasî dê ew bixwara. Hişê xwe anî serê xwe. Zû xwe vegerand, derket ser rûyê avê, û xwe ji şûrmasî xelas kir. Qasekî din, ji bo binê deryayê bibîne, xwe berda binî, di binê deryayê de rastî masîyan hat, sed hezar masî hebûn. Nêzî yekî ji wan bû û pirsî:

Heval, ez xerîb im. Ji rêyeke dûr têm. Ev der ku der e?

Masî gazî hevalên xwe yên din kir:

- Va ye yekî din jî.

Paşê li Masîyê reş vegeşîya û got:

- Tu bi xêr hatî deryayê. Hemî çem û çiqleçem tên vê derê, ku tu bixwazî, tu dikarî bigihêjî koma me.

Masîyê reş ê piçûk pir kêfxweş bûbû, ji ber ku ku gihastibû deryayê, weha got:

- Pêşîyê ez bi dilê xwe li deryayê bigerim, bibînim û piştire bigihêjim we, ew ê weha hîn çêtir be. Careke din ku we tora masîvan kişand binê deryayê, ez jî dixwazim ku bi we re bim.

Masîyekî:

- Tu dê di nêzîk de bigihêjî daxwazîya xwe. Nuha ji xwe re bigere. Lê dema ku tu derkevî ser rûyê avê, haya te ji reşreşik hebe. Her rojê hetanî ku çar-pênceanan ji me nexwe, dev ji me bernade, nahêle ku em ji xwe re rehet bijîn.

Masîyê reş ê piçûk ji komê veqetîya, ji xwe re dest bi gera xwe kir. Piştî demekê derket ser rûyê avê. Taveke germ hebû. Tavê germîya xwe dida pişta Masîyê reş û ew jî bi wê germîyê dilxweş dibû. Bi kêf û bê deng ji xwe re digerîya û di dilê xwe de ji xwe re weha digot:

- "Nuha mirin dikare zû were serê min. Lê hetanî ez zindî bim, divê ez nekevim nav lepên mirinê. Rojekê ku rastî wê werim û ez ê werim jî, lê ew ne tiştê girîng e. Tiştê girîng ev e, ku zindîbûna min, an mirina min dê li ser ên din çî bandorê bihêle."

Masîyê reş negihaşt ku li ser van tiştan baş bihizire, reşreşîkê ew girt û firîya. Masîyê reş di nav nikulê reşreşîkê de xwe bir vî alî-wî alî, lê nikarîbû xwe ji nav nikulê wê rizgar bikira. Reşreşîkê ew di nav nikulê xwe de pir şidandibû, ku ew hema hema dikir bimire. Masîyek, bê av çiqasî dikare bijî? Wê dixwest ku reşreşîk wê bixwe, qe nebe ew dikare qasekî di nav zikê wê yê şil de bijî. Ji lewre ji reşreşîkê re got:

- Çima tu dixwazî min bixwî? Ez masîyekî wisa me, ku dema ez bimrim, tev canê min dibe jehr.

Reşreşîkê tu tişt negot. Lê di dilê xwe de ji xwe re weha digot: "Hii dekbaz, nuha çî xerabazîyan dişêwire. Dixwaze ku ez pê re bipeyivim, devê xwe vekim, ew jî bireve!"

Erd ji dûr ve xuya dikir û hin bi hin nêz dibû. Masîyê reş ê piçûk ji xwe re dihizirî "Ku em bigihêjin erdê, mirina min e". Ji bo vê yekê ji reşreşîkê re weha got:

- Ez dizanim, tu dixwazî min bidî çêlikên xwe, lê hetanî em bigihêjin wê derê, ez dê bimirim û bibim jehr. Ma gunehê te bi çêlikên te nayê?

Reşreşîk difikirî. "Dibe ku ev masî dixwaze min bixapîne. Na, ew nikare tiştê bike". Dema ku Reşreşîk ji xwe re weha difikirî; dît ku canê Masîyê reş sist bû û xilxilî. Ji xwe re got; "Gelo ew mir? Nuha ez jî êdî nikarim wî bixwim. Min çiqasî bêrîya xwarina masîyekî weha xweşik û teze kiriye". Bi van şêwran, gazî Masîyê reş kir:

- Hevalê piçûk, ma hema piçek rih di te de nemaye ku ez bikaribim te bixwim?

Gotina xwe hîn neqedandibû. Dema ku ji bo bi Masîyê reş re bipeyive, devê xwe vekir, masî ji devê wê ket. Reşreşîkê fam kir ku ew hat xapandin. Da pey Masîyê reş. Masîyê reş wek birûskê dihat jêr. Devê xwe yê ziwa ber bi bayê ku ji deryayê dihat vekir. Ew gihast avê, lê hîn bêhna xwe nedabû, reşreşîk gihastê û ew daqurtand.

Masîyê reş fam nekir, ka çî hat serê wî. Piştî demekê dît ku dora wî tarî û şil e. Rêya revê tune bû. Dengê girînekê dihat, dema ku çavên wî hînî reşayîyê bûn, masîyekî piçûk ku xwe xistibû quncikekê de dît, masî gazî dêya xwe dikir.

Masîyê reş nêzî wî bû û got:

- Ka rabe. Ka tu yê çî bi ser xînî ku tu wisa gazî dêya xwe dikî?

Masîyê piçûk:

-Tu..k..yî? Ma, tu.. na.. bînî, va ez dimirim! Hû, hû, hû dayê. Ez êdî nikarim tora masîvan bi te re bikişînim binê avê û biqetînim, hû, hû, hû dayê!

Masîyê reş ji vê girîn û nalîna wî pir tûre bû, bi ser de rabû û got:

- Bes e, êdî negirî. Nuha baş li min guhdarî bike. Ez dixwazim reşreşikê bikujim, da ku tev masî jê xelas bibin. Lê ji bo ku nalîna te nebihîzim, pêşîyê ez ê te ji vir derxim der.

Masîyê piçûk:

- Ji xwe va ye tu nêzî mirinê yî. Tu dê çawa reşreşikê bikujî?

Masîyê reş xencera xwe derxist.

- Bi vê xencerê, ez ê ji hundir ve zikê reşreşikê biçirînim. Nuha baş li min guhdarî bike; ez ê herim û werim, reşreşikê bixwurînim. Dema ku ew devê xwe veke û bikene, tu birevî.

Masîyê piçûk:

- Lê, tu yê çi bikî?

- Tu derdê min nekişî. Hetanî ez vî hûtî nekujim, dernakevim der.

Masîyê reş di nav zikê reşreşikê de çû-hat, çû-hat. Masîyê piçûk li ber devê dilê çivîkê, ji bo derkeve der, rawestîyabû. Dema ku reşreşik kenîya û nikulê xwe ji hev vekir, masîyê piçûk xwe avêt nav deryayê, nav serbixwebûnê. Li benda Masîyê reş ma.

Qîjîni bi reşreşikê ket, çend caran li dora xwe çû-hat û piştê ket nav avê. Li ser rûyê avê jî hinekî perpitî, derman tê de nema, di cîhê xwe de ma.

Ji Masîyê reş tu deng derneket, û hetanî nuha jî ne kesî ew dîtiye û ne jî tiştê jê bihîstiye."

Masîya pîr çîroka xwe qedand û ji diwazde hezar zarok û nevîyên xwe re got:

-Êdî dema razanê ye. De herin razin.

Zarok û nevî tev bi hev re:

- Pîrê, te ji me re qala masîyê piçûk nekir, ka çi bi wî hat?

Masîya pîr:

-Ew jî bila ji sibê re bimîne. Nuha dema razanê ye. Şev baş!

Û yazdehezar û nehsed û not û neh masîyan got 'şev baş' û ketin xewê. Masîya pîr jî raza. Lê masîyekî sor, nikaribû rakeve. Ew hetanî berbangê li ser deryayê de dihizirî.

Samed Behrengî di sala1939 an de li Tebrizê hatiye dinê. Zarokê malbateke xizan bû. Jîyana xwe di nav gundîyan de derbas kir. Her dem li dijî zilmê şer dikir. Ji bo zarokan gelek pirtûk nivîsandine. Di sala 1968 an de bi destê nokerên şahên Îranê hat kuştin.

EFRÎN



CIWAN QADO

Wek kulîya berfê ya pêşîn
wek bêhna benîştê daran
wek nanxweşkên berî paşîvan
wek qemûşên merd ên gumana nîvcî
wek pîjdankên deştan
wek şevbestên teze yên ber destê sibê
wek rengê paçê ku nih ji ser birînê rabûye
wek qeymaxê zirzîyê yê kizûrî
wek dilopên di sênîkan de civîyayî
wek kêrên di bin balîfan de razayî
wek tama kurkura girîyê bêdeng
Navê te li ser zimanê me distirê
EFRÎN.

Jixwe berî Firdosa gerok a sersar û bêhêvîyan
Bêhêvîyên ku wek berxên reş di nav kerî re li gor fedîya zanebûnê ya
jixweber derbas dibin.
fedîya ku ji xwe perdeya jixweberîyê ya hevîrmêşî ye.
dibe tiştêk bedîhî di mirovekî de hebe wek hilandina gwîzanekî di bin
balîfa xwe de.
lê mirovekî xurû bedîhî tune.
ji xwe ya ne bedîhî ku mirovek tiştêkî bedîhî bibîne.
ka çawa çêkirina arvan û nan bedîhî tê dîtin?
sinetkirina zarokan?
gemkirina gambelean?
çûna ser tirban sibehên eydan?
vekirina Ta bi derzîyê ve û ji xwe berî her tiştî Ta?
Tayên birînan?
çêkirina zeletê û xwarina wê bi kefçî?
kefçîyê ku tu pê xoşava jixweberîyê li ber serê xilmaşbûyîyan difirfirîne!!!?
Navên Bavan?
Çavên Dêyan?
û Mifta derîyekî ku ev 7 sal pê nehatiye vekirin?
Jixweberî derîyekî li halê xwe sekinî ye, tu dîwar wî hilnagirin û li pişt jî
xanî tunene ku tolik û cinan kedî bikin.
xwekeşîfkirin e
xwekeşîfkirina dîlana sikûnê ye.
Mirêkeke mezin a bermeqlûb e xwe di te re dibîne.
Goleke Avê ye ji ber baranê maye
Parîyekî ezman tê de raxistî ye



BARÎN

Ahmedê Xursî

Esmera min a
Xwînsêrîn,
keça min a ji Têlîzeyneban bedewtir tu yî,
Xwişka min a ji hinguvê nanikan Şêrîntir tu yî,
Dêya min jî, kurman pêşîrên wê xwarin ew jî
tu yî,
Hela di rûyê min de
Bigirniye,
Bimizice,
Bila xwêzîya Xweda
dî gewrîya wî de ziwa bibe,
xwedawenda qeşingîyê yî tu,
bedewa bê hempa yî tu,
cêryên te ne
hemî perîyên buhîştan
cêryên te ne,
Belqîsên kotîyên Sulêmanan,
Zuleyxayên nemêrê ha
zenûbyayên hemî serdem û bîyabanan,
Sara Xel'î cêrya te ye,
Kilyopatra,
Monalîzên hemû serkidûmên welatên rojava,
Eştar tu yî,
Sadrîmos jî nîvkuştî ma,
Leyla Qasim bû,
ji wan heye ku kuştin; wa ye cardin tu yî,
Heyv tu yî
Roj,
Behrem,
Bercîs,
û her neh kewkebên din,
Gerdûnê cêrya te ye,
Gulên berberojkê hêvîyên min in,
û Kurdistan tu yî

EFRÎN

Şêro Dalînî

Tu girîyekî girs î
Di ser ê min de
Û bi min de dirijî
Di sînga min de navek heye

Ji çavên min tê xwendin
Xew nakim ta ku bê dîtin
Neffret li cîhanê be
Kurdê çeleng bê dar û pişt e
Jîyan di bablîsokê de
Kurd li jîyanê
Ji rastîyê wêdetir ew e;
Kurd di xwîna xwe de
Xwîn di dijmin de
Newêre nêzî xewna wî bibe.
Efrîn zeytûn e û zeytûn ya min e
Zeytûn Efrîn e û Efrîn ya min e
Efrînê..!

tiff bike rûyê gerdûnê û navê xwe di enîya Xwedê de binivîse

Barîn,
Evesta,
Amed,
Çekdar,
Şiyar,
Bagok
û Ararat
û hemîyan di zikê asîman de biçîne
û di gel sirûda nemiran
bixwîne.



Çavên Xeyidî



Ardilan Abdo

Hûn çî li min dinêrin!?
Hûn li benda min û çî ne, ku ez ji were bibêjim!?
Çîma wisa win bê deng in!?
Ne va ye çavên we pirsan mîna agir li kezeba van rojan dadidin,
Rojên pêxwas ji dad û wijdan,
Hûnê hêvîya çî ji min bikin!?! Ku ez ji were bibêjim,
Termên bê gor,
Û serîyên ku gewdên bê serî dîyarî hev dîkin.

Li alîyê din gorên vala,
Vala ye gerdûn, keko,
Vala ye mirin,
Vala ye jîyan,
Ta Xwedê jî vala ye,
Ji valabûnê ev hatin çêkirin.

Şewata kezebên şewitî,
Rojên mijgirtî,
Rastîya ku di nava pencên bazarvanên xwînê de hatiye cûtin,
Mejîyên zingargirtî,
Hovîtiya sexteyan,
Bexçeyên xwînê,
Alên reş di kezeba ronahîyê de didan çikandin,

Û li ser qêrînên zarokan dîlan gerandin,
Li ser girîyên dayikan mîna sînfonîyekê berîya xewê,
guhdar dikirin,
Rastî bi tirsê dan kujtin,
Rastî tê kujtin gelo!!!?

Miradîyên ku rêyên xwe winda kirin,
Çavên ku ji rondikan pê ve tişteki nizanin,

Hûn dixwazin ez ji were bibêjim:
Ez im ê ku hemû cûreyên mirinê bi çavê serê xwe dît,
Û hîn jî nemirî me,
Ev çi mirin e, mirina ku nikaribe min bimirîne!!!?

Çavên min a nuha ji min xeyidî mane, û ez ji gerdûnê hemû xeyidîme,
xeyda min ya kenê wan tîne,
Dizanim gavekê ne li pêş ne jî li paş dixwe.
Yên ku li ser mirina min dixeyidin û dudilê xew dikin. Li pişt perdeyê bi mirina
min xwe didin jîyankirin.
peyalên ku dagirtî ji êşên min li ser kezeba xwe dirijînin ta ku bikaribin bikenin.
Tenê êşa min dikarî wan bikenînin,
De bikenin hey qehpikno,
Bikenin,
Ta ji we were bikenin,
Ta hûn li ser kenên xwe biterpilin û ranebin,

Li wir,
Çavên li vir li wir in,
Dilên li vir li wir in,
Dil,
Çav,
Delalên axê li wir in,
Li wir zixurê axê dibin gule,
Û gule natebitin,

Ji êşistanên Rojavayê bipirsin,
Ji Aljînan bipirsin,
An jî, di du çavên wê de, hûn dikarin têra xwe bi rehetî bixwînin.
Di bin sirûda mirinê de, gotinên cengê diguvêşe.
Xwîneke tîr ji bînahîya awiran li ser deştekan vekirî, dadiwerive.

Li wir bihuşt kirin dojeh,
Li wir me ji Xwedê ditirsandin,
Li vir dixwazim hemû zagonên dadmendîya gerdûnê di bin pêlava xwe de,
biperçiqînim,
Û ji Xwedê re bibêjim şiyar be.

Her êvar gurzek girî di bêrîka şevê de, vedişêrim,
Her êvar bi şingêşinga guleyan re, nameyên bêrîkirinan bi destên tije kulmên girî
Dişînim.
Dişînim û her dişînim.

Ev welat ji goristanan ne birçî ye,
Ev gewd ji birînan ne birçî ye, keko.
Ew yê ku ji mirinê wêdetir pekîyan in.
Li vir zarok têra xwe birç' ne, pêxwas in, û jîyan di çavên wan de lerizî maye.
Lîstokên ku di rêyan de ji wan ketin.
Ji xwe ceng lîstokan bi zarokan dide jibîrkirin û zaroktîya ji tawanan xalî bi lez
didizin,
Ew nizanin kê ji wan daye ser piştê kê, rêyan an jî ew, kê yê din ji xwe re
helbijartîye,
Ew yê ku ber bi ne dîyarîyê ve têne ajotin.

Ev cihana ku ser û binoyî hev bû ye,
Qêrînên ku nayê guhdarkirin,
qêrînên bêdeng ê ku gewdê mirov dixwe, di paytexta sexteyan û xwedîyên alên
reş de nayê pejirandin.
Qêrîn li wir mirin e.
Ew in ên ku bi mirinê re rûbirdû bûn, dibêjin cêja koçberîyê têra xwe tahl e.
Dixwazim guleyekê berdin piştê van rojên birçî, rojên windayî, rojên cengê, û wê
li ser erdê ve bi temamî dirêj bikim.



ŞÊR Û KEROŞK

Hebû tune bû, carekê ji caran, şerek hebû ku hakimê hemî daristanan bû, hikumdarî li ser hemû lawir, teyr û tirûrên daristanê dikir.

Rojekê wî biryar da ku li ser her cinsekî heywanan şiv an taştîyekê ferz bike û ew her carekê bi dorê jê re bînin.

Rojekê dora keroşkan jî hat. Hemû li hev civiyan ku biryara xwe bidin bê wê çawa taştîya şêrî peyda bikin. Keroşkeke şareza ji nava wan rabû û got:

- hûn xema nexwin û îşê xwe pê mekin, ezê bi xwe taştîya şêr peyda bikim.

Hemûyan bi hev re gotin:

- Mala te ava.

Keroş bi dilaramî belav bûn.

Keroşkê me sêrojan li malê ma û bi ser şêr de neçû, bû roja çaran çû derket hizûra şêr. Şêr bi ser de qîriya û got:

- ma dora taştiya min ne li ser we bû? Ev sê roj in kes ji we bi ser min de nehatiye. Ez wilo birçî mam.

Kevroşkê bi rêz jê re got:

- Ezbenî, roja pêşîn min taştiya te anî, lê heywanekî din heye, her wekî te ye, rê li min girt û taştê ji min stend.

Şêr got:

- Gelo tu kesên dinê wekî min heye ku hikum li ser heywanên daristanê bike?

Keroşkê got:

- Belê heye. Heke te divê, rabe em biçin, ezê wî nîşanî te bidim.

Şêr got:

- de bide pêşiya min em herin cem wî hukimdarî.

Kevroşkê da pêşiya şêr, çûn û çûn heta ku li ser devê bîrekê rawestiyar, kevroşkê got:

- Va ye hikumdar di vêderê de ye.

Gava ku şêr bi ser bîrê de çemiya, wêneyê xwe di avê de dît, dîna xwe dayê ku şêrekî hema wekî wî xuya dike. Hema ji wêderê xwe avêt ser wêneyê xwe. Pê re çû binê avê, bîr kûr û teng bû, ew neşiya derbikeve, fetisî. Kevroşk jî û hemû lawir û teyr û tirûrên daristanê jî ji şêr û zilma wî xelas bûn.

JI ZARGOTINA KURDAN

ÇALAKIYÊN HRRK'ê 2017-2018



06.01.2017

Kirasê Bûkê Heft Reng e
Ji bo xweşkirina dîwarên dibistanên Qamişloyê.



Bi serperêstiya Desteya çand û hunerê ya kordinasiona giştî a ROJAVA
û bi hevkarîya Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê (HRRK)

Hêvdîtina ROJAVA ya hunera şewekariyê

Huner di nav gelan de, pîran ava dîke **الفن يبني الجسور بين الشعوب** **نحن اهل ههنا، وههنا صنعنا**

Ji 12-28 gulanê.

12.05.2017

Simpozyom li Kobaniyê

18.05.2017

[Kovara Rojava][Hejmar(0)] [Sala2018'ê] [Weşanên HRRK'ê]


Pêşangeha şêwekariyê li Zanîngeha Rojava.
Ev herdû çalakî di gel Desteya Çand û Hunerê hatin li

Darxistin



20.05.2017

Çaremîn Mihrcana Rojava ya Çand û Hunerê li Qamişloyê



31.05.2017

Li ser gora Şêx Maşûq vêxistina mûmên dilsojiyê.



**DILDARÊ
ŞEKO**
MÊVANÊ HRRK'ê YE
ROJ: ÎN, 09.06.2017
KATJIMÊR: 20.00
CIH: HOLA ZANA
HRRK

Publi Domani

09.06.2017

Dildarê Şeko, helbest xwendin,
Li Qamişoyê, Hola Zana.



VEXWENDIN
BO ENDAMÊN HRRK'ê
YÊN CIZÎR Û KOBANIYÊ

Komîteya Kargêr we vexwendî
komcivîna hemî endamên Cizîr û Kobaniyê dîke..!
ÎN, 16.06.2017
KATJIMÊR: 11.00
CIH: Qamişlo, Hola Zana
TÊKILÎ: 0988155174. 425134

HEVGIRTINA
REWSÊN BÎRÊN
ROJAVAYÊ
KURDISTANÊ

HRRK

HÛN BI XÊR WERIN!

16.06.2017

Komcivîna endamên HRRKê yên Cizîr û Kobaniyê li Hola Zana li
Qamişloyê.



HRRK KOBANÎ



Çarşem, 28.06.2017. Seet 17.00 **Pêncsem, 29.06.2017. Seet 17.00**
Li Dibistana Şehîd Hogir **Li Navenda Ciwanên Şoreşger**
Simînera Dildarê Şeko **Şevbuhêrka Helbestê:**
Ehmedê Huseynî. Dildarê Şeko. Cihan Hesen. Ednan Hesen. Aras Hiso
Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê

28.06.2017 Semîner û 29.06.2017 Şevbuhêrka helbestê li Kobanî



23.07.2017

Li HOLA ZANA, di pêşangeha pirtûkan de, çalakiya Meryem Temir ji bo imzekirina pirtûka xwe.



24.07.2017

Li Hola Zana, di pêşangeha pirtûkan de, çalakiya Imadedîn Mûsa ji bo imzekirina pirtûka xwe.



27.10.2017 Helbest xwendin li Amûdê Ehmed, Dildar, Ibrahim Şihab



26.08.2017

Komek ji endamên HRRkê yên Cizîr û Kobaniyê, di gel çend endamên Yekîtiya Nivîskarên, serdana eniyên şer li Tebqa û Reqayê dikan.



26-28.12.2017

HRRKê bi alîkariya YPGê, li Reqayê, li Dewar Elneîm, Sîmpozyoma Reqayê li dar dixîne.



05.02.2018

Şandeke ji Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê HRRK bo piştgiyariya berxwedana Efrînê ber bi Efrînê ve bi rê ket.



Careke din jî di gel Yekîtiya Nivîskarên Kurd-Suriya û Yekîtiya Rewşenbîrên kantonê ber bi Efrînê ve çûyîn.



1.2.3.02.2018

HRRKê li pêşberî navenda xwe, Konê piştgiriya efrînê vedigire.



05.05 2018

Pêncemîn Mihrîcana Rojava ya Çand û Hunerê li Kobaniyê.

Şêwekar Zuhêr Hesîb
Wergirê yekemîn xelata HRRKe



HRRK



Ekremê Gemo
Sponsorê Xelatê

Hevgirtîna Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê



13.05.2018

HRRKê yekemîn xelata xwe ya afirandinê radigihîne.



YEKEMÎN XELATA HRRK'ê

**BO QADA REWŞENBÎRIYA KURDÎ
BO RAYA GIŞTÎ YA ROJAWAYE KURDISTANÊ**

Bi çavekî li xwe û li derdora xwe dinêre da ku rê nede kêlikên dijwar ku wisa bi hêsanî ber bi nemana xwe ve bi-revin, kêlikan zêft dike, perwerde dike, hûsbwar dike da ku bêyî êy û derd û kuf û hesretên yê erdnigariyê piştî xwe nedin tegehrêdana dayikan û berdeewariya dîteran û kes-erwedana aşiqên azadiya derengmayî.

Û bi çavekî din li gorepanên zaroktiyê li benderên bitanînan, li bira bajaran û gundan, li rehên destê û li xemgîniya çavên xuşk û dayikan dinêre, li vir komkuji, li wir talan û kavi, li vir xewnên mezin û li wir xolînên mezin lewra di navbera herdu çavan de, rengên êqr û kîta û bîrnan di-herkin, dîsa di navbera herdu çavan de, Barîn wekû îkon-eyekê diçirse, jnên Kurd govenda tîliyan digerin û rengên êşa mezin bi ser-gorstanên hiş û birê de dîbarin.

Di vê hevkeşa reng û rû û rûbarên sor û narincî de, şewekarî peyama xwe ya wijdanî, ya hestiyarî û ya dahîsan û afirandîne radigihîne; em ji pê re pê re peyama xelata xwe radigihînin û şewekarê Kurd Zuhêr Hesib wek xelatgirê Yekemîn Xelata HRRKê ya afirandîne hildibijêrin.

Her wisa hêjayî gotinê ye ku nîrxê xelatê yê mewdanî û aborî ku 1000 dolar e ji alî karsaz û welatparêzê kurd Ekremê Gemo hatîye texan kirin.

Em bi navê HRRKê spasîyên germ aresteyî Ekremê Gemo dikin.

Komîteya kargêr a HRRKê
Qamişlo
11.05.2018